



Parêzer: Mîsnü Ündül:

Bêdengî cesaretê dide dewletê

Hevpeyvîn: Şair û nivîskar Nasir Hefîd
Serokê ku gotina xwe neanî
cih, divê li ser kar nemîne

Rûpel 8-9

Xurşîd Mîrzengî

Wêjeya zimanê kurdî

Rûpel 10

Qelemşor Komarnas

Komara gurê pîr

Rûpel 14

Cejna we ya Qurbanê pîroz be

NAVEROK



4

Salihê Kevirbirî: Di civaka kurd de rola mîr û axeyan



7

Sevda Eldemir: Koma Dengê Azadî ya nû



11

Fereç Çobanoğlu: Dixwazim listikek kurdî jî bilîzim

Ji Xwendevanan

DI hejmarê 61'ê, ya Azadiya Welat de; ji hêla Birêz Roşan Lezgin ve, li ser xwedîderketinê li zimanê kurdî, bangeke li me xwendevanan hat kirin. Hevalê me bi vê banga xwe dixwaze diyariya gelek tiştên girîng bide me. Me banga wî ya dilnî hil-da û bi rastî jî li ser me tesîreke giran çêkir. Gava em li nav rûpelên dîrokê dinîhêrin, em dibînin ku ziman ji çar endamên netewebûnê (welat, ziman, çand û aborî) endameke jî tevan girîngtir e.

Dewletên dagirker dema ku xwastinê gelekî bindest asîmîle bikin, di nav xwe de bihelînin; berî hemû îştî dest bi pişavtina zimanê wî gelî kirine. Lewre, ji bo neteweyekê ziman, nîrxekê hevpare ye. Bi vê taybetiya xwe ziman, gel bi hev û du ve girê dide, dibe hoya jêkatiyê.

Zordestan, ji bo ku zimanê kurd ji holê rabikin gelek karên qirêjî meşandine. Bi teoriyên li dijî zanistiyê û derewîn, xwestine ku wî zimanekî hebîngêh bidin nişan, lê bi ser neketine. Bi destan, stran û çirokan, zimanê me hebûna me heta îro parastîye. Em hebûna xwe ya îro ji zimanê xwe re deyndar in. Îro sazîyên me yê wekî MED-TV, rojname û kovarên we yê wekî Azadiya Welat, jiyana Rewşen û Zend û hwd. hene. Ev sazî piştî gelek zehmetiyên hatine avakirin. Divê em alikariyê bidin van sazîyên xwe û van xurt û bilind bikin. Bi taybetî jî em xwendevan; pêwîst e ku em bi xebatên akademîk angû bi yê çand û hunerî pêş ve biçin. Ev jî bi hînbûnê te-kîz çêdibe. Ez jî dengê xwe tevî banga heval-Roşan dikim û bang li hemû hevalên xwe yê dibistanan dikim. Hevalno! Em li zimanê xwe xwedî derkevin.

RIFAT DUMAN



Hunera tîmên taybet û wêneyên Hanîfî

SAMÎ TAN

Piştî ku rapora Komîsyona Susurlukê ya Meclîsa Tirk hate daxuyandin, ji Rêveberê ANAP'ê Eyüp Aşık pişîn, ka ew li ser raporê çi difikire, wî jî got: "Çete hê li ser kar in." Derdorên demokrat berî wî bi salan dabûn zanîn ku çete li ser kar in, lê ji bilî polîs û dozgerên dewletê kesî guh neda gotinên wan. Ewên ku guh danê jî xwediyên van gotinan girtin, îşkence li wan kirin û ew avêtin hundir. Mebûsên DEP'ê ji ber vê sedemê ji meclîsê hatin avêtin û bi salan ceza li wan hate birîn.

Lê rastî neguharî, hê jî çete li ser kar in, karê xwe bi hovitiyê nedîtî dimeşînin. Ji roja ku ew meseleya çeteyan hatîye rojevê heta niha bi dehan mirov ji aliyê van çeteyan ve piştî îşkenceyên xedar hatin kuştin.

Derket holê ku dewlet li ser çeteyan ava bûye û heta reng û naveroka dewletê neguhere, wê çete serdest bin. Lewre di van rojan de ku gel bi girseyî çeteyan lanet dike, bi çend bûyeran hate selmandin ku hemû serdestên dewletê çete ne.

Bûyera yekemîn ew bû ku waliyê navenda çeteyan (Hekariyê) Kemal Kılıç hate bertîrkirin û wekî serokê emniyetê yê

giştî hate peywardarkirin. Tevî ku navê wî zilamî di nava endamên çeteyan Geverê de derbas dibû û karê herî kirêt li herêma di bin desthilatiya wî de pêk dihatin.

Li aliyê din mirina Serokê MHP'ê Alparslan Türkeş nişan da ku kî çi cure mirov e. Hemû serdest ketin pêşbirka pesindayîna wî û partiya wî. Hate dîtin ku çi ferqa van partiyên din ji MHP'ê nîn e. Di warê şovenîzmê de ew ji Türkeş ne kêmsazetir in.

Bûyereke din ku rengê dewleta tirk baş da xuyakirin, salvegera damezirandina rêxistina polîsan bû. Ev roj wekî cejna polîsan hate binavkirin. Kesên ku wê rojê riya wan bi aliyê Taksîma Stenbolê ket bi çavên serê xwe dîtin ku dewleta tirk dewleta polîsan e. Polîsan bi hêzên xwe yê cur bi cur Meydana Taksîmê dagir kiribûn, hemû rê hatibûn birîn. Heqa niha tu cejnên resmî û olî bi vî awayî nehatin pîrozkirin. Dengê daholan û bandoyê guhê mirovan ker dikir. Gel bi bixof di nava wan re derbas dibû, diçû karê xwe. Êvarî di hemû kanalên televîzyonê de cejna polîsan nûçeya yekemîn bû, hinek dîmen ji hunerên polîsan dihatin nişan dan (wekî pêşandana hunerên segên hevotî û tî-

mên taybet ku xwe ji firokeyê diavêtin xwarê), paşê jî dihat gotin ku gel bi çepikan piştevaniya polîsan kiriye.

Li aliyekî ev dîmen û li aliyê din dîmenê guhên jêkirî, laşên parçekirî. Wêneyê Hanîfî Karabulut ê ku ji hêla tîmên 'xwedan huner' ve digel sê gerilayan bi îşkenceyê hatiye kuştin. Dihata zanîn ku hêzên dewletê koleksiyona guh û bozên mirovan dikin. Dema serên jêkirî di rojnameyên ewrûpî de derketin, rayedarên dewletê sûcê xwe nepejirandin û ji bo ser vê bûyerê bigirin, li Basayê 11 gundiyan kurd şewitandin. Paşê jî rojnameger birin cihê bûyerê, kuştin gundiyan kurd ku hinek ji wan welatpêrêz bûn xistin stûyê hêzên gerîla.

Lê îcar her tişt êşkere ye, wêne her tiştî dibêjin, hewçeyî gotinan nake. Bes çapemeniya tirk a "paqij" deng nabe xwe. Tu rojname û kanalên televîzyonê cih nadin wan dîmena, lewre guhê Hanîfî jî bo başiya dewletê hatine jêkirin. Jixwê çeteyan çi kiriye ji bo xêra dewletê kiriye. Dema ji bo xêra dewletê be û li dijî PKK'ê be her cure hovîtî rewa ye di çav qelemşorên tirk de.

Lê em dibêjin, kesê ku li hemberî vê hovîtîyê bêdeng bimîne, nikare doza paqijiyê bike. Çi kesê ku li hemberî vî şerî qirêjî demekeve heta ber qirikê di nava qirêjîyê de ye û şirikê vê hovîtîyê ye. Di dawiyê de em lanetê bi van hovan dibarînin û cejna gelê xwe ya qurbanê pîroz dikin.

Ji jiyana metropolon

BIRÛSK ARJÎN

Dema bêjeya "metropolê" tê ziman, gelek tiştên hiş û bîra mirov. Qesr û koşkên berz ên ji betonê ku ber bi asîmanan ve hilkişiyane, gerîdeyên (erêbeyên) ku wekî xelkên zencîran hev û din dişopînin. Dikan û mexazeyên manîfatura ku cilên bedew û xelîyên bûkan bi piştî camekanên wan de berdayî û neqîşandî; dikan û mexazeyên ji kursî, mase, paşgeh û xalîçeyên herî buha û balkêş, tijî. Bar û lotikxaneyên cihê alkool, dans û reqsê û hemû kêf û şahîyan. xwarinxaneyên ku li devê deriyê wan goşt û mîrîşkên li ser şîşan dizivire. Pastexaneyên ji pasta, her cure şîrînî, û dondirmeyên reng bi reng dagirtî. Şeqam û kolanên ku bi xortê şareza, bejnzirav, cilbedew û ku modayê dişopînin dagirtî û qîzên ji boyaxê û bi mûçirkê, xwe ji rengê xwe deranîne, pêşkêşî çavên birçî dikin û hwd.

Metropol bi van xweşiyên xwe, cara yekemîn, xeyala mirovan dagir dike, di hest û raman û di bin hişê wan de bi cih dibe. Lê rastîyêke din heye ku di bin

Dibin navê metropolê xweş û van xweşikahîyan de, tev xewn û xeyalên mirovên rêwî û berendamên metropolan, ji hîmê wan hildiweşîne. Ev jî ne şîrîniya rûyê metropolan e, berevajî vê, tehî, nexweşî û rastiya naveroka metropolan e.

navê metropolê xweş û van xweşikahîyan de, tev xewn û xeyalên mirovên rêwî û berendamên metropolan ji hîmê wan de hildiweşîne. Ev jî ne şîrîniya rûyê metropolan e, berevajî vê, tehî, nexweşî û rastiya naveroka metropolan e.

Li metropolan ger tu xortek bî, ji bo ku di jiyana xwe de tu van xweşiyên bî, divê tu gelek salan ji xwedî sermiyanan re koletiyêke tûj bikî. Ango ji bo ku tu ji xweşahîyên metropolê parek be ji bijî, divê tu bi keda xwe metropolê hê bêhtir li ser serê xwe mezin bikî, di afirandina qesran (apartmanan) de bişixulî, di zeviyan de di kargehên hesin, dar, fêkî xwarin û hwd. de bi bedewa keda xwe biferîşî.

Tu qîz bî, ji bo ku parek ji vê jiyana xewnarî bijî, divê, tu di zeviyan de her roj tevrikê bişixulî, di kargehan de bibî firaqso, malên dewlemend û karsazan vernalî, bişoyî û cih bidê, li karxa-

neya karsazekî, bibî sekreter; li gorî dilê karsaz cilan li xwe bikî, rûyê xwe ji boyaxê, reng û mûngî bikî, çîpên xwe tazî bikî û xwe bikî hedefa çavan ên wekî şûr tûj û birçî û hê wêdetirin.

Tu mindal û zarok bî; divê tu dibistanê nûçê biterikî, di xwarinxaneyan de bibî firaqso, di qehwexaneyan de bibî îskanso, şîrînî, simit û kadeyan biferîşî, bibî boyaxvanê pêlavan, qehwe, kolan bi kolan, şeqam bi şeqam bigerî. Li rawestgeha gerîdeyan (erêbê) û trenan, ji sed hezar, deh-hezar, yan jî sed hezar kesî tava bikî, da ku pêlava xwe bi te bide boyaxkirin.

Tu dayik bî, bav bî, bavpîr bî, tuyê di nava diwar û qesrên tev ji beton çêkirî de bibî dil, di nava milyonan insan de bi tenê bi mîna ker û lalan û bi hesteta gelî û zozanên xwe, gund û bajarên xwe, daristan û zeviyan xwe û zimanê dayika xwe hûrik hûrik bihelî û bihelî.



Di civîna Komîsyona Hevpar a Parlamentoya Yekîtiya Ewropayê (JPC) de pîrseke Seroka Komîsyonê Claudia Roth a li ser mafê jinan Tansu Çiller heîrs kir û wê got: "Tu mafê biyanan nîn e, têkilî karê me yî hundirîn bibin." Li hemberî daxwaza parlementereke yewnan a ji bo dîtina mebûsên kurd ji Çillerê got ku ev yek girêdayî biryara wezîrê têkildar e. Lê paşê rê nedan ku mebûsên ewrûpî hevdiîtinê bi mebûsên kurd re çêbikin. Li ser vê yekê Claudia Roth li ber Girtîgeha Ulucanlar daxuyaniyek da û got: "Heta ev mirovên ku ji ber dîtinê xwe hatine girtin, di hundir de bin, ezê her tim têkilî karê we yê hundirîn bibim."



SEROKÊ Giştî yê HADEP'ê Murat Bozok û 11 rêveberên partiyê piştî 10 mehan roja 14'ê avrêlê hatin berdan. HADEP'yan xwestin bi awayekî girseyî herin pergîniya rêveberên partiyê, lê rayedarên girtîgehê berî ku gel were ber girtîgehê ew berdan. Li ber navenda giştî ya HADEP'ê gel bi slogan û tîlîyan çû, xêrhatina wan kir. Wekî tê zanîn di kongreya duyemîn a asayî ya HADEP'ê de piştî provakasyonêkê bi îdîaya ku wan ala tirkan avêtîye erdê û wêneyê Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan daleqandîye, ew hatibûn girtin. Îlîraîkar Murat İpek jî berî vê bi çend rojan da zanîn ku ew li ser daxwaza polîsan wekî provakator beşdarî kongreyê bûye û gel ji bo daxistina ala tirkan fîl kirîye.

NÛÇE

Parêzer Hüsni Ündül:

Bêdengî cesaretê dide dewletê

Rewşa Girtîgeha Erzeromê ji her alî ve taybet e. Digel rayedarên girtîgehê bandora ramanên neteweperest û faşîst li ser tirk ê herêmê jî heye. Şaforên teksiyan malbatên girtiyan nabin girtîgehê û televîzyonên herêmî li dijî girtiyan propagandayê dikin.

Piştî ku 12 şoreşgeran di rojîya mirinê de jiyana xwe wînda kirin, raya giştî ji berê bêhtir bi rewşa girtîgehan hesiya û reaksiyonên tûj nîşan dan. Lê belê, digel ew qas reaksiyonên naxweyî û cihanî dewleta tirk dev ji hovîtiyên xwe berneda û li Amedê 10 girtî bi awayekî hoyane hatin kuştin.

Rewşa girtîgehan ji ber çewsandin û zordariyên li Girtîgeha Erzeromê dîsa di rojevê de cihê xwe girt. Li Girtîgeha Erzeromê girtiyan PKK, DHKP-C, TDP, MLKP û TKP/ML-B ji bo mafên xwe yê bîngêhîn di 10'ê adarê de dest bi greva birçîbûnê kirin. Çalakiya girtiyan ber bi 40 rojan ve diçe û ji aliyê 47 girtiyan ve tê domandin. Her wiha li girtîgehên Trabzon, Giresun, Ordu û Elbistanê jî çewsandin û zordariyên li ser girtiyan didomin. Ji aliyekî din ve heftêya borî girtiye PKK'yî Salih Çelikpençe ku ji ber îşkenceyên bi nexweşiya "sîroza kezabê" ketibû ji bo ku bi mehan nehatê tedawîkirin jiyana xwe wînda kir. Di daxuyaniya IHD'ê de ya li ser mirina Salih Çelikpençe de tê diyarkirin ku niha di girtîgehan de dora 500 girtî û bersûc li ber mirinê ne û nayê tedawîkirin.

Girtîgeha Erzeromê ji her alî ve taybet e. Digel rayedarên girtîgehê bandora ramanên neteweperest û faşîst li ser tirkên herêmê jî heye. Şaforên teksiyan malbatên girtiyan nabin girtîgehê û televîzyonên herêmî li dijî girtiyan propagandayê dikin. Her wiha li hemberî parêzerên girtiyan kompe tîlî lidarxistin û hin parêzer bi hinceta kuryekariyê hatibûn girtin. Berpîrsên girtîgehê digel ku ji bo rewşa girtiyan eleqeya nîşan nadin, ji aliyekî ve ji li ber qawîşan xwarinê çêdikin û girtiyan wekî "dîn" bi nav dikin û dişînin "timarxane" yê. Wekî tê zanîn, ji dilên Girtîgeha Erzeromê şeş girtiyan ji bo şermazkirina zordariyan xwe şewitandibûn û du gir-

tiyan jî xwe bi dar ve kiribûn. Ji van girtiyan yekî jiyana xwe wînda kiribû.

Li ser rewşa girtîgehan û nêzîktêdayîna dewleta tirk ya li hemberî girtiyan me dîtinên Parêzer Eşber Yağmurdereli, Serokê IHD'ya Amed û Cigirê Serokê Giştî yê IHD'ê Mahmut Şakar û Serketerê Giştî yê berê yê IHD û Parêzer Hüsni Ündül girtin

Yağmurdereli, Şakar û Ündül bi taybetî bal kişandin ser pêwîstiya demokratîkbûna rejimê û da zanîn ku bêtî çareserbûna kêşeya kurd û demokratîkbûna civakê pîrgirêkên girtîgehan çareser nabin. Parêzer Hüsni Ündül bi awayekî zelal diyarkir ku sazî û rayedarên dewletê dixwazin heta hetayê desthilatdariya xwe bidomin. Ji ber vê yekê li girtîgehan hemû destkeftin ne mayinde ne. Lewre Ündül xwest ku mirov li hemberî êrîş û zordariyên dewletê her dem hişyar bin û têkoşîneke domdar bidin. Piştî Hüsni Ündül gotina xwe wiha domand: "Rayedarên dewletê ji bo ku mafên wêlatîyan ji wan bistînin, di kemîne de ne û her li li benda keysa xwe ne. Jixwe rewşa girtîgehan jî ve yekê diselmîne."

Parêzer Hüsni Ündül da zanîn ku, dewlet dixwaze bi teslimgirtina girtiyan, civakê teslim bigire ji ber ku ev mirov di nav civakê de yê herî peyînkir û hişyar in.

Her wiha Parêzer Hüsni Ündül daxuyand ku, çewsandin û zordariyên li ser girtiyan bi piranî jî aliyê civakî ve meşrû tîlî dîtin û dewlet jî ve yekê sûde werdigire.

Li aliyê din Serokê IHD'ya Amedê Mahmut Şakar got ku ji dema 12'ê rezberê heya îro rewşa girtîgehan bi giştî



wekî berê maye. Şakar da xuyakirin ku dewlet girtîgehan wekî çekêkê di destên xwe dihele û ji bo çewsandin û tirsandinê civakê bi kar tîne.

Mahmut Şakar daxuyand ku li Tirkiyeyê îdamên veşarî hene û wiha axivî: "Li Tirkiyeyê di salên dawî de cezayê îdamê nayê bicihanîn. Lê belê, di girtîgehan gelek girtiyan ji ber nexweşî, îşkence û birçîtiyê dimirin û dewlet jî bo vê yekê tu tiştî nake. Ev înfazên veşarî û hêdî hêdî ne."

Dozgerê Girtîgeha Bayrampaşayê bi helwesta xwe bala raya giştî kişand ser xwe û di çapemeniyê de jî bi awayekî dorfireh li ser hate rawestîn, me li ser vê yekê jî dîtinên kesên navbirî pîrsî. Bi piranî helwesta dozger wekî helweste ferdî hate nîrxandin. Ündül ev wekî nêzîktêdayîna dozger, wekî tiştêkî demdemî û nejdîl bi nav kir. Lê Parêzer Eşber Yağmurdereli jî da zanîn ku helwesta dozger tiştêkî awarte ye û rayedarên girtîgehên din û dozgerên din jî ve zivêr (aciz) dibin û li dijî derdikewînin.

Wekî kesekî jî heyeta ku berê jî bo çavdêriyê çûbû ve girtîgehê Parêzer Hüsni Ündül diyar kir ku, dewlet bi awayekî zanayî dixwaze Girtîgeha Erzeromê bike mîna Girtîgeha Diyarbekî-

rê ya dema 12'ê rezberê. Piştî jî wî got ku mafên tîlî dayîn piştî şeş çar mehan bi sîlî ve tîlî standin. Mahmut Şakar jî rewşa Girtîgeha Erzeromê jî bo îro wekî ya herî kambax anî zimên.

Ji daxuyaniyên jorê jî diyar dibe ku divê mirov li ser rewşa girtîgehan bi şeweyekî hûrbînî bifikire. Ji ber ku rûyê rastîna yê dewletan xwe herî zelal û berbiçav di girtîgehan de dide der. Wekî mirovan kesayetiya rastîna ya dewletan jî gava ku bûn desthilatdar derdikeve holê. Li aliyê din her wekî ku Mamoste Fikret Başkaya jî di nivîseke xwe de diyar kiribû, zêdebûna hejmarê girtiyan siyasetî nîşana nêzîkbûna civaka nû ye. Lê divê mirov girtiyan bi tenê nehêle, da ku civaka nû hê nêzîktir bibe.

Wekî encam em dixwazin qala pîroznameyê ku ji Girtîgeha Erzeromê ji me re hatî bikin. Lewre ew pîrozname jî, rewşa girtîgehê bi awayekî zelal dide nîşan. Name li ser navê girtiyan ji aliyê Hasan Alkış û Murat Çetinkaya hatiye ve hatiye birêkirin. Tiştê balkêş ev e, karmendên ku nameyên girtiyan dixwînin, ser peyva "devrimci (şoreşger)", "PKK" û heta tîpa "D" ku tê wateya "devrim (şores)" jî reş kirine.

MAZLUM DOĞAN

Di civaka kurd de rola mîr û axeyan

Heger hêrsa gel li dijî mîr bilind bibe, gava guhartina mîr were xwestin, wê gavê bi daxwazek pašmîr tê agahdarkirin. Paşmîr jî, şekalên mîr tîne, li dîwanxaneyê datîne ber lingên mîr. Heger Mîr li dijî vê guherînê rabe, şekalan naxe lingên xwe û pašmîrê xwe bi xwînxwarên (xulam) xwe dide kuştin. Şayet mîr ji bo vê guherandinê bêje "Erê", wê gavê şekalan li lingê xwe dike, piştî vê bûyerê jî, ji malbata mîr keseke din dibe mîr.

Li Kurdistanê di civak û rêxistîniya eşîrî de yekane berpirs û serokê eşîrê axa ye. Ji axa bexêber di nav eşîrê de tu kar û xebat nayê kirin. Zewac, şer, aşî herdem bi erêkirina axayê eşîrê ve girêdayî ye. Ev qaîde, jî bo piraniya eşîran wiha ye. Lê belê rol û girîngiya "mîr" di mershaleyê cihê û taybet de tê nixandî. Mîrîti bi saya xelîfeyên ebasîyan, di nav eşîrên kurdan de cihê xwe girtiye. Begên ebasîyan dema li ser hin eşîran hikum dikirin "sîstema mîrîtiyê" jî didan meşandin. Otorîteya mîr di ser otorîteya axayê herî bihêz re ye. Di cudabûna mîr û reisên (axa) eşîran de, tiştê sereke ev e ku mîr ji malbateke "esîl" tê.

Serokê eşîrê, li dijî kesên eşîrê xwedî berpirs e. Ew wezîfedar e ku can û malê eşîra xwe, li dijî wan eşîrên din biparêze. Li hêla din, li nav eşîrê berpirs e ku aqubet, yekîti û pirsîrêkên hiqûqî çareser bike. Têkiliyên eşîrên cînar û derdorê jê tene pirsîn. Mirov dikare bibêje ku ev yek siyaseta eşîrê ya derveyî ye. Heger di nav eşîrên cînar de pevçûn

çêbibe navberkarî jî dikeve ser milê serokê eşîrê. Li ser navê eşîra xwe beşdarî peyman û hevdiînen aşîyê dibe. Mêvanên ku eşîrê ziyaret dikin, di dîwanxaneyê xwe de dihevine. Têkiliyên di navbera otorîteya navend û şexsên eşîrê de birê ve dibe....

Civata mîr gelekî dewlemend, cihê-reng û balkêş e. Her dem li derdora wî 2 rihspî, mele, 2-3 xulam, 4-5 kedxweda (besleme) û fedaiyên ku ji wan re "xwînxwar" tê gotin, hene.

Piştî mirina axa desthelatdarî dikeve destê kurê wî. Heger kurê wî tunebe, birayê wî dibe axa. Axatî bi mirovatiya xwîni re rasterast pêk tê. Heger piştî mirina axa bira û kurê wî jî tunebin, wê gavê rihspî dicivin û axayê nû di hilbijêrin.

Sîstema mîrîtiyê

Bi vî awayî li nav van eşîran bi tenê gotina mîr derbas dibe. Her çiqas li wan herêman, li bin mîr axayên eşîrên kurd hebûna jî, ew axa nikaribûn li ser navê eşîra xwe, ji gundiyan baca (vergi) gund bistînin,

Sîstema dîwanxaneyê (Menzela Mezin)

Mîr, axayê axeyan e. Navê cihê ku lê rûdine "dîwanxane" ye. Dîwanxane menzeleke gelekî fireh e. Piranî bi xalîçeyên ecem ve zemîne menzelê hatiye xemilandin. Derdora menzelê bi mînderên bi herî qelîte û balgîvên (balîv) bi morî hatiye pêçan. Taqên dîwaran bi môtîfên xezal û şahmeranan hatiye dorpeçkirin. Ji mîr bêdestûr bi tenê şewirkar û alîkarê wî "Paşmîr", axayê eşîrê, rihspî û mele dikarin bikevin dîwanxaneyê...

Pergala dîwanxaneyê, ji bo axayên eşîran jî derbas dibe. Dîwanxaneyê axa ji ya mîr ne cihê ye. Lê belê pašmîr di sîstema axatiyê de tune ye. Rûniştina li dîwanxaneyê ji bo nîqaş, xwarin û



sohbetkirinê ye; bi piranî 24 saetan vekirî ye. Li navenda dîwanxaneyê her tim cezweyekî mîna bejna zilamekî li ser piçotên agir heye û xulamên mîr ku tevahiyan wan mîr in çay û qehweyê îkramî mêvanan dikin. Divê li dîwanxaneyê dengbêjek jî muheqeq hebe. Dîwana dengbêj bêtam û bêkêf e. Dengbêj, li gorî daxwazên mîr û axeyan stranên şer û lehengiyê, kilamên evînî û mamîk û çîrokên gelêrî dibêjin. Hin kes jî hene ku ketin û derketina wan a dîwanxaneyê qedexe ye, ji wan re jî "kurmanc" tê gotin.

Eşîrî û kurmanc

Lê belê divê bête gotin ku wateya peyva kurmanc ev e ku; ew kesên di nav eşîrê de heliyane û kesên ku tu girêdana wan bi eşîrê re tune ye. Hebûna wan di nav eşîrê de nexweşîyan nayîne holê, lê belê karê herî giran jî bi wan didin kirin. Di nav vê sîstemê de ew kesên ku ji xwe re dibêjin "eşîr û eşîl" kurmancan dixin dereceya hemwelatîyên duyemîn. Ango mirov dikare bibêje ku di nav eşîrê de kesên Kurmanc mîna "kurê jinbavan"

têne nixandîn.....

Mîr, demokrasi û guherandin

Mîrîti li gorî axatiyê jî aliyê guherandinê ve bêhtir demokratîk û pêşverû ye. Heger hêrsa gel li dijî mîr bilind bibe, gava guhartina mîr were xwestin, wê gavê bi daxwazek pašmîr tê agahdarkirin. Paşmîr jî, şekalên mîr tîne, li dîwanxaneyê datîne ber lingên mîr. Heger Mîr li dijî vê guherînê rabe, şekalan naxe lingên xwe û pašmîrê xwe bi xwînxwarên (xulam) xwe dide kuştin. Şayet mîr ji bo vê guherandinê bêje "Erê", wê gavê şekalan li lingê xwe dike, piştî vê bûyerê jî, ji malbata mîr keseke din dibe mîr. Li Kurdistanê, di nav eşîrên kurdan de mîrîti wekî mertebeke gelekî pîroz tê binavkirin. Dîsa di dilê her axayê eşîrê ke kurd de mîrîti radizê.....

Çavkanî

*Pirtûka Muhsin Kızılkaya bi navê "Dünden Bugüne Eşkayalar"

*Hin rihspiyên herêma Botan

SALIHÊ KEVIRBIRI



Kurtedîroka kurdan

Kurdistan welatekî bi mêrg û kanî ye, bi dar û ber e, dewlemend e, bi awahiyê xweyî Mezopoamyayê navdar e. Mîna wê kêr welatên xweş hene. Ji ber vê yekê di dîrokê de gelek caran hêzên dagirker êrîşî ser Kurdistanê kirine. Her dem jî gelê Kurdistanê ji aliyê hêzên kedxwar ve hatiye qetilkirin û talankirin. Gelê kurd çiqas li hemberî kedxwaran serhildan kiribe jî serfiraz nebûye. Lê belê ji berî İsa heya sedsala 7'an de gelê kurd li hemberî zordestî û zilimkariya împaratoriya asûriyan 300 salî şerê berxwedanê meşandiyê. Dawiyê di bin serokatiya Qiyaxser de şerekî pir dijwar meşandin. Împaratoriya Asuriyan hilweşandin û împeratoriya Med damezirandin. Piştî demekê împaratoriya persan, împaratoriya Med hilweşandin. Piştî ku gelê kurd dused û bist salî di bin destê persan de man, hêzên İskenderê mezin êrîşî birin ser persan, dewleta wan hilweşandin û gelê kurd ketin bin bandora helenan.

Welhasil em dirêj nakin. Dûre gelê kurd ketin bin bandora ermeniyân, roma û sasaniyan. Piştî avakirina îslamê di bin serokatiya Xelîfe Ömer de hêzên ereba êrîşî ser Kurdistanê kirin. Gelê kurd li hemberî wan hêzan çiqas li ber xwe dabîn jî serfiraz nebûn. Hêzên Xelîfe Ömer ji Ruhayê hetanî Sêrtê kesê kurd ên ku li ber xwe didan cendekê

wan bi daran ve dadiliqandin. Piştî ku ereban Kurdistan fetih kirin li hemberî êrîş û zordestiya feodalî ya ereban gelê kurd di bin serokatiya Babek de gundiyên serhildan û berxwedanê mezin pêk anîn. Bi sed hezaran mirovên kurd ji aliyê hêzên abasiyan ve hatin kuştin. Berxwedana Babek serfiraz nebû. Lê belê gelek hêzên kedxwaran hatin zerzilandin.

Piştî vê zerzilandina hêzên abasiyan

Zor û şer li ser Kurdistanê kêr nabe. Şahê Ecem hêzên xweyî hov şandin ser Keleha Dimdimê. Di bin serokatiya Yekdestê Biradost de gelê di kelehê de berxwedanek mezin da. Berxwedana wan hetanî dilopa xwîna dawiyê jî dom kir û hemî nemir ketin. Tovê berxwedanê çandin. Wekî din jî berxwedana Şêx Seîd û Seyîd Riza yên din çêbûne.

kêr ketin jî Wanê hetanî Ruhayê dûgela dewleta Mervaniyan kurd hat saz kirin. Dûgela Merwanî ya kurd zêdeyî sedsalî domand. Piştî zayînê sedsala sezdehan de Kurdistan kirin du parçe, faris û tirkan li hev par kirin. Lê belê parçeyê Kurdistanê yên mezin dibin bandoriya osmaniyan de ma.

Zor û şer li ser Kurdistanê kêr nabe. Şahê Ecem hêzên xweyî hov şandin ser Keleha Dimdimê. Di bin serokatiya Yekdestê Biradost de gelê di kelehê de berxwedanek mezin da. Berxwedana wan hetanî dilopa xwîna dawiyê

jî dom kir û hemî nemir ketin. Tovê berxwedanê çandin. Wekî din jî berxwedana Şêx Seîd û Seyîd Riza yên din çêbûne. Her gav jî kedxwaran mîna hovan serhildanên gelê kurd têk birine. Gelê kurd li ber mirin û nemanê bûn. Niha emê bèn ser şer û berxwedana me ya îro.

Naskirina neyar û şerê teybet. Di dema osmaniyan de Ebdulhemîdê duymîn, li hemberî berxwedana gelê kurd

jî êl û eşîrên kurdan Alayên Hamîdiyê ava kirin. Emê bala xwe bidin zagonên osmaniyan:

Zagonên osmaniyan ne yên kapî-alîzmê ne, ne yên îslamê ne. Gelo zagonên osmaniyan çi ne? Heçî osmanî diz in, talanker in, çavbirçî ne, dagirker û pêxwas in. Qet bi keda xwe nexebitîne. Her gav çavê wan li keda gelan e. Ji bo şexsiyeta xwe ne bavê, ne bira û ne mirovatiyê nas dikin. Ji milk û waran pê ve kesekî nas nakin. Jiyana sultanên osmaniyan li ser şer û selahiyê ye. Şer ji wan re haceta debarkirî ye. Kuştin

û serjêkirina insanan ji bo awayekî hilberînê ye. Hilberîna wan ne li ser keda gundiyan e. Aboriya wan li ser şer e. Bi hêzên xwe ji kîjan hêza xurttir bûya êrîşî ser wan dikirin û qetil dikirin, dest datanîn ser milkê wan talan dikirin.

Heçî serokên sazûmana komara Tirkiyê ye, bîngeha xwe li ser pergala osmaniyan danîne. artêşa wan, artêşa osmaniyan e, karmendê wan, karmendê osmaniyan in. Bi fen û fûtan komara tirkî ava kirine.

Her dem hevalê xwe xapandine. Şer li ser piştî wan meşandine. Devera ku hêzên wan nikaribin têkevinê û lingê xwe biavêjinê, bi kesên wekî Çerkez Ethem li hemberî serhildanên gelan ji derve şerê gerîla didin meşandin. Çerkez Ethem serhildanên gelan yên derve têk birin.

Gelek êl û hozên kurdan jî alîkariyê-ke mezin bi komara tirk re kirine. Piştî ku neyarên xwe ji derve hat safikirin komara tirk hat avakirin wekî Çerkez Ethem serokê hêzên kurdan bi bêbextî kuştin û bi sed hezaran kurd qetil kirin. Kemalîstan hevalên xwe yên İtîfati Terakkî jî di sala 1926'an de kuştin. Welhasil hevalên li dora, ên ku alîkariya wan kiribûn kes nehiştin. Li ku derê yekî zordest û faşîst hebû serokê komara tirk ew da derdora xwe.

HALIL KURT

Cejna hemû xwenas û bindestan pîroz be

CELALETTİN YÖYLER



Cejna Qurbanê û ya Remezanê, du heb cejnên olî ne bi wate û xudan naverokên girîng in.

Lewre dema ku em li naverokên perestiyên olî dinîhêrin, em dibînin ku hemû perestî ji bo armançekê bi tenê navgîn in ew jî ku her xwenas in e.

Belê bi rastî û zanyarî hemû perestî navgîn in yekemîn in û pir birûmet in ji bo ku kes bi wateyên naverokên wan perestiyên, xwe bigihînin qonaxên here bilind û birûmet ew jî ku her 'xwenas in e'. Lewra Xweda di wateyên wan perestiyên de birêk fermanên xwenasîne pêşkêşî kesên bawermend dike û ji wan re dibêje: "Hûn hemû bendeyên min in, min hûn afirandine. Dema hûn li ser rûyê cîhanê xweş û gîhan in, fermanên min bêkêmayî pêk bînin û bizanin ku ev cîhan a we hemûyan e."

Wê demê divê hûn heçî tiştê ku ji xwe re dixwazin, wî jî heval û hogirên xwe re jî bixwazin. A ev in wateyên perestiyên

olî. Her wisa perestiya 'Rojî û Hecc' jî ji bo van ramanan in. Ango kesên ku rojî girtin an jî hec kirin ew jî çî ku wateyên naverokên wan perestiyên pêk tînin, di dî pêkanîna wan perestiyên re dikevîne nava şahiya pêkanîna wan perestiyên û dikevîne cejn û şahiyê.

Lê gelo misilmanên îro bi awayê naverokên wan perestiyên dimeşin an nameşin? Fermanên Xweda pêk tînin an pêk nayînin? Hem jî gelo çî ne pêkanîna wateyên wan naverokên perestiyên? Çawa ku me got pêkanîna fermanên Xweda e. A ew kesên ku wateyên wan naverokan bi bawerî û xwenasîne pêk tînin, wan cejn û şahiyên dikin ji bo ku fermanên Xweda pêk anîne.

Lê ewên ku fermanên Xweda pêk nanîne û cejn û şahiyên dikin, cejn û şahiyên wan êdî ne olî ne. Lê ez dikarim bibêjim hînbûyî ne. Ango ew her wekî wan ên ku dibêjin: "Bav kalê me wiha dikirin em jî wekî wan dimeşin." Ango ew êdî ne cejna olî ye, her dîtin û adetên wan e. Gelî xwendevanên hêja, ewên ku emir û fermanên Xweda pêk nayînin û bi sedan û hezaran mafên mirovan didin bin piyan, xwîna bi hezaran mirovan dirêjin, ma gelo cejna wan a olî ye? Na. Wan bawerî bi

emir û fermanên Xweda yên ji bo parastina mafên mirovan neanîne û cejna wan jî ne olî ye. Heca wan jî, rojiya wan jî ne olî ne.

Wekî wisan e cejna olî ya bindest û belengazên ku mafên wan ên mirqvahî bînpê dibe ye. Lewre wan bindestan çî ku bindest in, nikarin emir û fermanên Xweda, yên ji bo parastina mafên gelan û kesan bînpê bikin.

A bi van ramanên zaryarî û felsefî ez dibêjim: Gelî belengazên koçberên kurdên reben û ewên wisa cejna we pîroz be. Gelî ewên ku we ji bona bîdestxistina mafan û rizgarkirina rûmeta gelê xwe û axa xwe têkoşîn daye û ketine zîndanên cejna we pîroz be. Gelî dayikên ku hûn bûne mînak ji bo hemû jinên bindestên di cîhanê de, bi serhildanên xwe yên şoreşgerî cejna we, pîroz be.

Gelî şoreşgerên ku hûn têkoşer in ji bo rizgarkirina çîna qaraker ji bin destê kedxwarên keda gelan, cejna we pîroz be. Lewre hûn hemû çînan ku min nedane rêzê, bi awayê fermanên olî têkoşînan dimeşînin. Li hemberî kedxwar û dagirkeran û xwînxwaran cejna we û hemû xwenas û bindestan pîroz be.

LI SER MALBATÊN ŞEHÎDAN Û

XEBATKARÊN PARTIYÊ ÇEND GOTÎN

Riya şoreşê riyêke dijwar e. Pir bikelem û bixem e. Badokên wê pir in. Elem û kederên wê gelek in. Zor û zehmetiyên wê çiqasî pir bin, rûmeta wê jî ew qas mezin e. Jixwe rûmeta wê ew qas ne mezin bûya mirov tu carî nikaribû ew qas zehmetî kul û keder bikîşanda.

Di cihanê de gelên ku xwe ji bin bandora mêtîngeriye rizgar kirine, rizgarkirin bi hesanî çênebûye. Tiştên ku îro tîrên serê gelê me rîya ku îro em tê re derbas dibin piranî ya gelê cihanê jî di vê rê re derbas bûne. Gelên ku bixwazîn serbixwe bibin û bibin xwedî rûmet, divê ku badokên asê biborin. Di cihanê de tu gel bi hesanî, bêyî xebat, têkoşîn, kuştin û mirin serfiraz nebûye. Gelê cihanê jî bo azadiya xwe û ji bo azadiya welatê xwe bi milyonan xwîna kesên xwe dane rijandin. Em gelekî li dûv gelên cihanê mane.

Gava ku mirov çavekî diavêje dîroka Kurdistanê, keser dikeve dilê mirov. Ev demêke pir dirêj e ku welatê me di bin lingên neyarên hov de dike nalenal. Hinek serok û xweşmêrên kurd rabûn xwestin ji bo gel tiştêkî bikin lê belê fikr û ramanên wan yêr kevnar serokatiya wan ya nehemdem û nezaniya wan ya herî mezin jî ji rizgariya gel re bû astengeke mezin. Gava ku hêzên biyan alîkarî ji wan dibirî wê gavê tevger jî dişkest û hemû tîk diçûn.

Ev rewş heta bi derketina Tevgera Azadiyê berdewam kir. Bi dertetina Tevgera Azadiyê re ev rewş bi carekê re hate guherandin. Lê belê çawa hate guherandin?

Gelê me bi fedekariyê mezin, bi baweriyeke xurt bi partiyê ve, bi serokatiyê ve, bi şehîdan ve girêdayî ye. Partî ne ji bo gelê kurd tenê, jî gelê tirk, jî bo gelê Rojhilata Navîn û jî gelê cihanê yêr bindest jî bûye hêviyêke mezin. Bûye hêviya rizgariya gelê bindest, bûye hêviya mirovahiya dinyayê.

Hetanî duh gelê kurd ji hebûna xwe jî zimanê xwe jî çand û hunera xwe bi kurtayî ji kurdbûna xwe dîreviya û jê şerm dikir. Lê îro bi ked û xwîna şehîdan bi lehengî û mîrxasan şer bilind bû jiyaneke nû hate afirandin. Erê jiyana nû jî hêla her kesî ve rûmet dît. Îro kî zêde xwe bi kurdîtiyê bide xuyakirin ew qas tê ecibandin û rûmet dibînin. Nav û dengê partiyê li her hê-

lê belav bûye, destê wê dirêj bûye û digihîje her hêlê. Ev pêşveçûn bi çiqas awayî çêbû? Çi qewimî ku jiyana gelê kurd ji tunebûnê, ji jiyaneke lewitî hat vegeandin; paqij û zelal bû, serfirazî nêzik bû. Bêguman bersiva van pirsan ne pir giran e. Hevokê kurt wekî ku me li jor jî da xuyakirin bi ked û xwîna deh hezar şehîd, bi ked û xebata şervanên azadiyê û bi ked û xwêdana bi milyonan gelên fedekar gişk kom bû û di kesitiya serokê mezin de tê bikaranîn.

Şehîd rûmeta me ne, ew bingeha serfrazîya me ne, em çiqas wesfê şehîda bidin jî hîn kêr e. Mezinbûna wan qedirbilindbûna wan bêpîvan e. Divê her dem em şehîdan binin bira xwe, li ser wan binvîsin û wan bidin jiyandin. Ev bi xwe mijara gotarekê ye. Mebesta me, em hîn bêhtir li ser malbatên şehîdan malbatên girtiyan û malbatên gerîla rawestin.

Rewşa malbatên ku emê binin ziman çiqas ye? Bi çiqas awayî nêzikî têkoşînê dibin, wezîfeyên xwe yêr welatparêzî çiqas bi cih tînin. Çiqasî li şehîdan xwedî derdikevin. Ji bo ku bûne

Divê ku ji her kesî bêhtir malbatên şehîdan li têkoşînê xwedî derkevin. Bela ku wan parçekî canê xwe xistiye şoreşê. Axa welatê wan, bi xwîna zarokên wan şil bûye. Rizgariya welat ji her kesî bêhtir ji wan re divê. Bela ku ji her kesî bêhtir êş û elema şoreşê ew dibînin. Zilm û zordariya neyar hîn zêdetir li wan tê kirin.

xwediyê şehîdan bûne xwediyê xebatkarên partiyê? Daxwaza wan jî gel çiqas ye? Ji welatparêzan çiqas ye? Ji partiyê çiqas ye? Çiqas layiqî şehîdan in? Çiqas daxwazî û fermanên wan bi cih tînin û li wan xwedî derdikevin? Divê ev pirs werin bersivandin.

Ji destpêka têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê heta îro gelê me jî deh hezara bêhtir şehîd daye, 35 hezar şervanên azadiyê li serê çiyê ne, deh hezar di girtgehên neyar de dîl in, ew qas jî di nav refên eniyê de xebatê dikin. Gava ku em van kom bikin sed hezar mirov dikin. Ev sed hezar xebatkar jî sedhezrar malbatên wan hene.

Bêguman di nav van malbatan de malbatên welatparêz fedekar û heta dawiyê bi her awayî wezîfeyên xwe yêr welatparêzî bikartînin hene û di partiyê de ne jî ev rewş xewş tê xuyakirin û jî hêla her kesî ve jî tê dîtin. Lê belê di nav van malbatan de mal-

batin hene ku nêzikbûna wan bi gel re, bi partiyê re, bi welatparêzan re nezanî û xeletî ye. Bi xapînokî û nerastî nêzikî têkoşînê dibin. Meşa wan a bi partiyê re ne dilgerm e. Gelek caran şehîdan û xebatkarên partiyê îstismar dikin. Pir kes jî wan zexel in, zor û zehmetiyê nadine xwe, bi xwîdana xwe bi keda xwe nexebitin, debara xwe nakin. Çavên xwe berî malê welatparêzan didin û dixwazîn partî, xebatkarên partiyê, wan û malbatê wan xwedî bikin.

Ew kesên ku berê kurên wan an jî keçên wan di nav refên partiyê de cih bigirin ew jî wekî kesên di nav civakê de ne, tu zêdebûna wan jî kesên civakê tune ye.

Lê gava dibin xwedî şehîdî dibin xwediyê xebatkarên partiyê, bi saya wan şehîd û xebatkarên partiyê edî ew jî dibin xwedî rûmet. Her kes hurmetê nîşanî wan dide. Diçin ku mirovên welatparêz xwe jî daxwaziyên wan re amade dikin. Gava ku dikevin tengasiyê an nexweşiyek tê serê wan, welatparêz bi hewara wan ve diçin li hal û waxtê wan dipirsin û jî derdê wan re

dibin derman. Gava ku jî hêla mirovên welatparêz ve rûmeta mezin dibînin, jî ser xwe ve diçin. Dibêjin qey ew pir mezin bûne. Ew rûmeta ku mirov didin wan jî bo partiyê ye û jî bo ku ew xwediyê şehîd û xebatkarên partiyê ne. Lê belê ew vê yekê nabînin. Dibêjin: "Min nizanibû ez ew qasî mezin im."

Bi vî awayî hem xwe û hem jî welatparêzan dixapînin. Bi ku ve diçin gazinan dikin. Tîbûn, birçibûn û tazîbûna xwe didin xuyakirin. Nexweşiyên giran li xwe peyda dikin. Gava ku qal tê qalê û mirovên welatparêz li rewşa wan dipirsin, belengaziyê dikin û hema dibêjin: "Wele kurê min kesekî li mala me binêre û me xwedî bike tune ye. Bi rastî jî rewşa me pir xerab e. Ew tiştên ku hebûn jî me tev de dan rîya şoreşê. Hûn jî dizanin yê ku li malê dinêrî hevalê we Rênas bû. Ew dest û lingê me bû. Sala çuyî şehid

ket. Heval jî kes dest navêjin me. Tu kes alîkariya me nake. Me qey diviyabû wiha bûyâ? Me ew qasî rebenî, belengazî dît, me ew qasî êş kişandin ma qey a me û ya we diviyabû bi vî awayî bûya?

Bi vî awayî dilê xelkê xwe bi halê xwe dişewitîn. Diherin li ser navê partiyê dirav û tiştên din ji nav welatparêzan didin hev. Devê wan tim jî hev, diherin ku parsê bikin. Ji xebatkarên partiyê re jî xebatkarên eniyê re û jî welatparêzan re astengiya derdixin. Gotinên nebaş jî gel re dikin. Dibêjin: "Hûn bînamûs in, hûn ne welatparêz in, jî bo çiqas hûn zarokên xwe naşînin çiyê?" Bi vî awayî welatparêzan jî têkoşîna vidiciniqîn, dilê wan jê sar dikin. Ji pêşveçûna têkoşînê re dibin asteng.

Halbûkî karê mezin dikeve ser milê wan. Gava ku bi rastî û duristî nêzikî partiyê, nêzikî gel bibin, rolên xwe bi rastî bilizin ewê pêşveçûneke mezin pêk bînin. Ji aliyekî ve ew dibin xwediyê şoreşê. Divê ku ji her kesî bêhtir malbatên şehîdan li têkoşînê xwedî derkevin. Bela ku wan parçekî canê xwe xistiye şoreşê. Axa welatê wan, bi xwîna zarokên wan şil bûye. Rizgariya welat ji her kesî bêhtir ji wan re divê. Bela ku ji her kesî bêhtir êş û elema şoreşê ew dibînin. Zilm û zordariya neyar hîn zêdetir li wan tê kirin.

Ew kêmasiyên ku me li jor da xuyakirin bi piranî ji nezaniyê tîr kirin. Sedema van kêmasiyan kedîbûna kesitiya mirovên kurd e. Ev gemar jî hêla neyar ve li gelê me kom bûye. Şuştin û paqijkirina vî gemarê hinkirina xet û jiyana partiyê ye. Gava ku xebatkarên eniyê û xebatkarên partiyê bi zanebûn wan wezîfeyên xwe bi cih bînin, xeta partiyê bi rastî bidin xuyakirin, bi dil û can xwe bidin xebatê, ew nikarin sextekariyê bikin. Nikarin şehîda îstismar bikin, nikarin li ser ked û xwîna şehîdên xwe dewlemend bibin. Xebatkarên partiyê ku bi zanebûn nêzikî wan bibin û wan zana bikin ewê hîn bêhtir nêzikî şoreşê bibin. Şoreşgerî û gerêdana xebatkarên partiyê malbatên şehîdan bi partiyê pêçan û welatparêzkirina malbatên xebatkarane. Ew çiqasî malbata bikin welatparêz, ewê ewqasî nêzikî xeta partiyê bibin.

ŞEHMUS DEMİR



● 22 Avrêl: Roja rojnamegeriya kurdî. Mîqdat Mîhad Bedirxan, di sala 1898'an de cara yekemîn li paytexta Misrê Qahîreyê rojnameyeke kurdî bi navê "Kurdistan" derxist. Piştî vê rojnameyê di sala 1908'an de li Stenbolê jî aliyê Sureyya Bedirxan ve dişa rojnameyek bi navê "Kurdistan" hate weşandin. Di sala 1919'an de jî, Muhamed Mihîrî Hîlav li Stenbolê rojnameyek bi navê "Kurdistan" weşand. Roja 22'yê avrêlê jî ber ku cara yekemîn rojnameyeke kurdî hatiye weşandin, ev roj wekî "Roja Rojnamegeriya Kurdî" tê qebûlkirin.

● 24.04.1915: Qetlîfama ermenîyan. Li Kurdistanê jî aliyê dewleta osmaniyan ve bi sedhezaran ermenî hatin kuştin, koçberkirin û di rîya koçberiyê de jî bi hezaran ermen qir bûn.

● 24.04.1986: Santrala Çemobîlê teqiya. Santrala Çemobîlê a nukleer li Sovyeta berê teqiya û deh hezar mirov jî ber radyasyonê mirin û bi hezaran mirov jî jî ber radyasyonê seqet man. Radyasyona ku ji santralê li derdorê wê belav bû li ser surîştê jî pir tesîr çêkir. Li Tirkîyeyê li qeraxa Behra Reş jî radyasyon keke xwarin û vexwarinên wekî çay û bindeqan û jî ber ku dewletê nikaribû van xwarinan bifroşe, li derveyî welat, li bazarê firote gelê xwe.

● 26.04.1994: Serokê DEP'a Semsûrê Abuzer Önen jî aliyê hêzên tarî ve hate qetilkirin.

● 24.04.1995: Serokê HADEP'a Elbîstanê Hüseyn Koku jî aliyê hêzên tarî ve hate qetilkirin.

AWIR

Koma Dengê Azadî ya nû



Endamên Koma Dengê Azadî niha heft kes in. Di muzîka xwe de org, tembûr, gîtar û amûrên ritmê bi kar tînin. Stranên ku pêşkêşî mêvanan kirin hemû bi kurdî bûn

Koma Dengê Azadî roja 11'ê avrêlê li Navenda Çanda Mezopotamyayê, konserek cihêreng da û nêzi 2 saetan bi temaşvanên xwe re ma.

Koma Dengê Azadî ev 3-4 sal e xebatên xwe didomîne. Lê niha jî endamên wê yê kevn kes nemaye. Ji ber wê yekê "wekî ku mezinan jî gotine" "Yên ku tên, çavên mirov li yê ku çûne, digerin" hem di kalîteya dangan de û hem jî di kalîteya muzîkê de; ji ber a berê ve hin kêmasiyên berbiçav bala mirov dikîşînin.

Komê bi strana Koma Amedê 'Berîvanê' dest bi konsêra xwe kir û 10 stran pêşkêşî mêvanan kirin. Hin ji van stranên ku ji xebatên wan ên nû ne 'Ez te baş nas dikim', 'Ji te dûtîm, birîn kûr im' û strana bi navê 'Fedi' ku li ser weşeta Amedê hatiye nivîsîn. Her wiha di gotinên van stranên de fikirîna bi tirkî balê dikîşîne û mirov tatrîn nake. Li gel van, hin stranên ku komê berhev kirine wekî 'Melazgîr', 'Wer lê kinê' 'Selîmo', 'Lê lê bejnê', 'Baran barî li Kurdistanê' û 'Dilê xerngîn' ku bi dimilkî ye pêşkêş kir.

Li gorî gotina endamên komê strana gelêrî ya bi navê 'Hawar gulê' jî aliyê xortekî ku wî bi darê zorê dibin lêşkeriyê ve, hatiye gotin.

Beşek ji stranê wisa ye: 'Dikim herim eskeriyê/ Destê min kelemçekîrî/ Hawar gulê gulê lê' Ligel van, gava ku du stranên ji kasetê Koma Dengê Azadî ya kevn, ku bi navê 'Nêrgîz' û 'Nizanîm' gotin, salon hîn bêhtir geş bû. Vê yekê jî bi bir xist ku di hê kasetê Koma Dengê Azadî ya kevn cihêkî cûda ye.

Piştî demekê berdevkê komê du hunermendên bi navê Kazo û Reşo dawetî cem xwe kirin û van hunermendan bi alîkariya muzîka komê hin stran gotin û bi vê yekê reng dan konserê.


Endamên Koma Dengê Azadî niha heft kes in. Di muzîka xwe de org, tembûr, gîtar û amûrên ritmê bi kar tînin. Stranên ku pêşkêşî mêvanan kirin hemû bi kurdî bûn, lê belê wan diyar kir ku; ji ber ku bi kurdî nikarin bi serbestî biaxivîn, axaftina xwe bi tirkî dikin û ji bo vê kêmasiyê jî lêborîna xwe ji mêvanan xwestin. Her wiha ew, stranên xwe bi pirdengî jî dibêjin.

Li gorî diyarkirina wan; niha jî bo derxistina kaseteke nû xebatê wan tunene lê xebatên wan li ser bijartin û çêkirina stranên henê, her wiha heya niha sê kasetên Koma Dengê Azadî derketine.

SEVDA ELDEMİR

ÇAVDÊRÎ

MÎRHEM YÛCÎT



Biaqil, nîvbiaqil û bêaqil

"**F**ilankes biaqil e û bêvankes bêaqil e." "Her kes jî aqilê xwe razî ye." "Aqilo zêrino di sere hemî kesî de nîno." Ev jî peyveke pêşyan e. Di nav sohbetên kurdan de behsa aqilê pêşî û paşî dibe. Mîna ku ne aqilek, belê çend aqil hebin. Oranî de aqilê tevger û serokayetiyan siyasî li Başûrê Kurdistanê munaqesê dibe. Beramberî aqilê rêveber û deshilatdar û li vî parçeyê welat şikeke dînamîk di rê de ye. Şika çêbûye roj bi roj mezintir dibe û bi xwe re rexneyên giran tîne. Ev nîşan û delîla guhartineke ber bi xêrê de ye. Ilîm û felsefe li aliyekî û aqil û fikir bi giştî li aliyê din gelek tiştan qerzdarê meraqê, şik û rexnekirinê ne.. Ji bo aqil û mejîyê rêxistinên li Başûr, "Di destên dijmin de ye. Ne azad e, li dijî xwezaya xwe ye. Aqilêkî ku berevaja, şaş û xelet kar dike. Rast nagere. Aqilê-kolan e. Ji kîsê xelkê ye.." tê gotin.

Aqil çî ye, çawa ye?
Hîn kes dibêjin tarîfkirîna aqil mîna tarîfkirîna Xwedê zor e û ne hêsan e. Lê careke di jî tarîfên aqil û hewlên tarîfkirinê zehf in. Tê gotin ku aqil tevahiyeke e abstrak û ezmanî ye. Û ev tevahî, ji hafîzê, fikrê, zihin û hwd. hatiye pê. Naxwe qabiliyeta fikiririnê ye jî aqil.

Zana jî hene aqil dişibînin febrîkayekê. Însan gava ji dayika xwe dibe ev fabrîka heye pê re. Aqil bi temen re xurt û balix dibe û piştê li cihêkî vedimire. Helbet aqil jî aqil bi kalîtetîr û bihêztir heye. Kalîte û hêza aqil girêdayî jiyane, perwerdekariyeyê tecrûbe û rewşa civakî û serpêhatiyên mirov çêdibe.

Me got hin aqilnas aqil dişibînin febrîkayekê. Ji bo febrîkayekê çî divên: 1- Materyalê xam û xav (fikir), 2- Embar û xezne (bîr) 3- Ardû û şewat (şik û tecessûs), 4- Muhasebe û arşiv (zihin) û 5- îmalat (fikir).

Istîsna ne tê de her kes xwediyê vî febrîkayeyê ye. Gelo ev tê maneya ku her kes biaqil e. Na, Mirovê biaqil kî ye?

Li gorî Mewlana mirovê biaqil ew kes e ku ji çirûskên ruhê xwe meşaleyê xwe pê dixê, pêşya xwe rohnî dîke û bi rîya xwe de dihere. Helbet ev tarîf hinekî romantîk û edebî ye.

Tarîfa ilîm jî ya Mewlana hinekî cihê ye: "Bi aqil ew kes e ku bi plan û zanebûn difikire, qerarên xwe bi xwe diafirîne û ji nav wan ya helî baş hildibijêre, dixê jiyane. Ew kesê ku ji bo pêşerojê xwedî tedbîr e û di zeman û cihê bi keys de alet û navgînên pêwîst bikarîne." Yanî ew kes e ku bi plan û bi mebest difikire, radibe û rûdine û çima û jî ber çî, çî dîke serwest e. Bi gotinê din kesek e ku berjewendiyên xwe, rê û rengên parastina berjewendiyên xwe û civata xwe nas dike.

Hîn aqilmend jî li ser esasê rewşa aqil-mirovan dikin çend celeb: 1- Biaqil, 2- Nîvbiaqil û kêmaqil yan jî dehbêlor.

Biaqil di destê wî de meşaleyê îrfan û rohnîdarkirinê heye: Hem rê rohnî dîke û hem jî dimeşe. Nîvbiaqil ne di ruhê wî de agir û ne jî di destê wî de meşale heye. Belê bi mirovên ku biaqil re hevaltiyê dike, qedrê biaqilan zane.

Dehbêlor ne zane meşale çî ye û ne jî bi aqilmendan re hevaltiyê dike.

Filozof û zanayên mezin jî di nav mijûliyên xwe de cihêkî berçav dane pîrsa aqil, fikir û pêzanîne.


Sokrat gava ku bi sofîstan re dikeve munaqeseyê, behsa hin qeydeyên negirêdayî zemên, daîmî û neguhêrbar dike. "Van qeydeyan mirov bi tenê bi rîya aqil ancax kare bigihê" dibêje.

Şagirtê Sokrat Platon jî li tiştêkî digere ku zeman pê nikanibe, di nav zemên de hilne-ye. Ev jî fikir û aqil e. Platon laşê însên jî serî, sîngê û jî dawê ava bûye dibêje û li ser wî esasî wiha ve nimûneya laş hinekî din vedike:

1- Serî cihê aqil e, 2- Sîng cihê îradê ye. 3- Daw cihê daxwazê ye. Aqil li pêzanîne, îradê li cesaretê û daw jî li daxwazê digerin. Filozofekî din, ku behsa serî û mejîyê bihêz dike Firanz Bacon e. Lê di nav pesindar û ahlîgîrên aqil de kes nikare hingên xwe li yê rasyonelîstên serdema rohnîdariyê bide.

Nasir Hefîd kî ye?

Di sala 1952'yan de, li Silêmanî ji dayika xwe bûye. Her li wir ji xeynî xwendina xwe ya destpêk û amadeyî, Koleja Kîştûkal (fakulteya Çandiniyê) jî, kota kiriye. Di sala 1971'ê de jî xwestiyê ku dîwaneke helbestan biweşîne, lê sansorê rê neda ye. Berî wê dîwanê, dîwaneke din jî tê windakirin. Di sala 1980'yî de dema ku zankoyê (zanîngehê) diqêdîne, dewlet dixwaze wî bigire, lê Nasir direve û xwe digihîne çiya. Salekê li çiya dimîne û paşê diçe Sûriyeyê; paştir jî, diçe Swêdê. Li Swêdê belavokê bi navê "Ji Dayikbûn" diweşîne. Her wiha dîwanek bi navê "Gîl" û çend gotar û semîner... Çend lêkolînên wî hene ku hê nehatine weşandin. Dîwaneke wî ya helbestê jî, di van nêzîkan de derdikeve.



Şaîr û nivîskar Nasir Hefîd:

'Serokê ku gotina xwe neani cih, divê li ser kar nemîne'

Şaîr û Nivîskar Nasir Hefîd bi dîtinên xwe yê felsefî jî deng daye. Li gorî Hefîd rewşên bîrên kurd û serokên partiyên ji heman çandê ne, her du jî peywira xwe nayînin cih. Nivîskarê rojnameya me SÎRWAN REHÎM bi wî re hevpeyvînek pêk anî. Hefîd li ser rewşa helbesta kurd li başûrê Kurdistanê û rewşa siyasî ya vî parçeyê welêt bîr û ramanên xwe anîn zimên.

We jî bi helbestê dest bi xebata xwe kir û heya niha jî we dest jê bernedaye. Gelo hûn bi çî çavî li îroya helbesta kurdî dinêrin?

● Min tu lêkolîn li ser "helbesta kurdî ya îro" nekiriye, lê ji ezmûna xwe ve, di sînorên başûrê Kurdistanê de, ji salên 70'yî û bi vir ve hinek têbînî li cem min çêbûne, ku pêwîst dibînim bidim xuyandîn. Ji wan notan jî;

Helbesta kurdî ketiye bin êrkekê (wezîfeyekê) ku ne karê wê ye. Ev yek ji ber çend sedemên e. Yek ji van tenêtiya helbestê ye, yanî tunebûn an jî qelsiya şeweyên din yê nivîstî wekî raman, gotara siyasî, lêkolîn û raportaj. Tunebûna azadiya çapemenî sedemeke din e. Lewre mirov di civîn û kombûnan de ji bo derbirîna bîr û baweriyên dest diavêjin helbest û sembolan. Egereke din jî şer e. Huner jî bi giştî ne bêpar e ji wê rewşa dijwar ku gelê kurd tê de ye. Bi tenê ban-

ga mirovan ji bo serbazî (eskerî) ji şer re ne bes e. Ku kuçikê pîs avekê diçelqîne, bi tenê ber çavê xwe lêl (şêlo) nake. Çawa ku şer çek dide destê zarok ku di rastî de ne karê wî ye, wisa jî êrkekê (wezîfeyekê) dixê ser milê huner ku pir eşkere wekî kirasekî (gumlek) ku qopçeyên wê xwar hatibin girtin tê xuyakirin. Demekê berî niha ez çûm serdana hunermendekî, di rastiya xwe de paşveçûna hunerî di karên wî de dihatin xuyakirin. Hewldan ji bo derbirîna wan bûyer û karساتan di karê hunerî de wekî helwesteke siyasî, pîrî çaran, bandora neyinî (negativ) li hunerê bi xwe dike. Huner di nav avekê de ye nabe dûman jê bilind nebe. Ev jî nayê maneya ku bibêjim; destê xwe sist bikin, bila av huner bi xwe be. Na, berevajî wê ez dixwazim dibêjim; destê huner bi hêztir bigirin, bila di vê lehiyê de nexeneqe. Erka hunermend û hozanê kurd di rojên wisa de girantir dibe. Çawa berhemêk diafirîne ku huner be jî.

Çawa dikare wî barê pir û giran biguhêze wî aliyê avê bê ku gemiyê bi xwe nefetise. Şer hijmarek tune dike, hejmarek seqet û hejmarek jî bi saxî derbas dibin. Dîrokeke dijwar jî hejmarek şaîr bi xwe re dişewitîne, hejmarek seqet û hejmarek jî rizgar dibin. Ewên ku rizgar dibin ewin ku dev ji peyama bingehîn bernadin; xosêwîstî, bedewî, serbestî, moral û têgihîştin, ku ev jî ji tiliyên destekî diçin. Ewên seqet dibin ew in ku tiliyek an zêdetir winda dikin. Ewên dişewitin, ew in ku dibin caş.

Ez wisa his dikim ku helbesta kurdî li Başûr ji salên 70'yan ve ketiye ser xetê ku heya niha jî, jê peya nebûye. Xetê ku berdewamiya dîroka helbesta kurdî nebe. Di rêka lasayî (taqlîd) de laşê xwe xistiye ser lingê yekekî din, bi lingên kesekî din dimeşe.

Li aliyê din xaleke girîng jî fêmkirina helbestê ye ew jî girêdayî helwesta şaîr ku ew çawa bi helbestê re dilive. Bi giştî cihê destê vê xalê bi şairan ve xuya ye, niha pir kes dimivîsin û tu kes jî wan fêm nake çî dibêjin. Helbest ne ew tişt e ku em jê fêm nekin. Ewê ku em ne jê fêm dikin û ne jî wê nas dikin, ne helbest e. Xwendevan jî hin tiştan ji helbest dixwaze ku li nenaskirina helbestê vedigere. Roj 23.11.1996 koreke (civîneke helbest

xwendin) me hebû li Stokholmê, di dawiyê de yekî hat û ji min re got: "Divê tu behsa wê jî bikî ku partiyên Kurdistanê yek diçe cem Iran û yek diçe cem Iraqê." Min jî jê re got: "Tu nikarî bi çetal şorbeyê vexwî. Tu ji bo guhdarkirina helbestê hatî. Heke ew qiseyên te pê bikin, hingê ji helbest derdiçe, dibe kevçî."

Her wiha xaleke ku divê li ser werewestî jî têkiliya partiyên û helbestê ye. Partî ne di wê astê de ne ku huner û edeb bikarin di desthilatdariya wan a siyasî de azadiyê wergirin. Helbest jî her wekî mirov bi xwe di bin mercê desthilatîyê de ye. Çavên partiyên tim li wî ye ka kîjan şaîr pesnê wan dide û xirabiyên wan vedîşêre. Ew bi rêka televîzyon, rojname û kovarên xwe kesên ku ne mirovên wan in mîna kesên ne hunermend û nivîskar didin nasîn. Heta bi vê jî namînin, heke ji dest wan bê pê xerabiyê jî dikin. Fazîl Caf di sala 1988'an de li Stokholmê Şanoya "Gêjeng" pêşkêş kir, YNK jî beyannameyek li ser wî nivîsand û ew bi saşî bi nav kir. Ev aliyekî partiyên e. Ji xeynî wê jî şerê hevdukuji, îxanet û xirabiyê bandoreke neyinî (negativ) li helbestê kiriye. Wekî mînak di berhemên Ebdulla Pêşew de mirov van şeweyên peyvên dibînin: Gewad, Xwêrî, Pêlav, tûkirin û hwd. ku li hemberî serokê

partiyên van tiştan dibêje. Û Ebdulla bi xwe jî wan mîna helwest, ne helbest bi nav dike. Ev mîna keke ku helbest dikeve bînerkeke dûrî siruştê xwe.

Peyama min a dawî di vê mijarê de ev e: Dema lehî radibe, dar û kevîran pir bi xwe re dibe. Ku lehî hêdî hêdî namînîna tawêrên (lat, kuç) gir dimînin her di cihê xwe de. Ewên biçûk in cih diguherin, ewên mezin reng diguherin. Ev rengê ku çiravê nav lehiyê ye li ser kevîran, rengê edeb û hunera wê demê ye. Ez hemîşe li bendê me ku dema dawî li vê roja sext hat, hinek şairê baş û edeb û hunereke nû jî serî hildin. Partî dikarin hinek şairan bi xwe re bibin. Lê belê tu car ez ne li bendê me ku şairê/î baş di nav destê wan de çêbibe.

Piştî ku hatin derve bêhna felsefeyê di nivîsandina we de serdest e. Gelo ew çawa çêbû û vê hêza nû çawa serî hilda?

● Rojê (sala 1992'yan) min ew qise di xwe de keşif kir; min her zaroktiya xwe de, tiştê ku ez niha dibêjim, wê demê jî, min digot. Tiştê ku îro dibêjim, ew e ku duh min nikaribû bibêjim. Berê me qiseyên dilê xwe ji mezinan vedîştartin, niha jî desthilatîyê.

Li bûyerên van du salên dawî, wate serê li Başûr (şerê kurdî) bi wî zimane felsefî we çend nivîsên cur bi cur weşandin, ji bo rewşa îro hûn çî dibêjin?

● Karesata wî şerî ewe ku ne şerê siyasî ye. Şer bi xwe bi surîşt (tabîat) trajedî ye. Ewê ku mirov bi salan çêdike, bi çend rojên şer tî xerakin. Ev karesat e

kurdan ne tenê ew e ku bi zimaneke din qise dike.

Şerê kurdî di van du salên dawî de, kir ku partî bi temamî bibin beşek ji saziyên desthilatîya wan welatên ku wan bi kar tînin. Lewma her dem dikarin aşbetaliyê (valakirina aş-sembola tîkçûna şoreşa Başûr a 1975'an e û PDK'yî jî vê navanînê gelekî aciz dibin) bi wan bikin. Lewre jî, partiyên tiştê wan bi xwe nemaye ku li ser berdewam bin. Ew boya-xa siyasî ya ku di xwe didan dema wê derbaz bû. Ew ne xwediyê gotîna xwe ne. Li rastê bi tenê şaşbûna gel dimîne. Tiştê ku ew dikin li ber çavan e. Partî bûn şirket şer kirin. Çi welatê di bazara şerê Kurdistanê de qonterateke wî hebe, ew jê re pêşbirkê dikin. Her yek ji wan dixwaze bide selmandin ku ji yê din baştir e. Tiştê xerabtirîn jî ew e ku ew amade ne ku bêmerc, bêdaxwazî û sertewandî kêşaya kurd, mafên mirovên kurd tîxe bin postalê dagirkerên Kurdistanê.

Piştî Şerê Kendavê, em kurdên ku berê kesî behsa me nedikir, ketin lista welatên mezin. Ev fersenda dîrokî ku bi destê kurd ket, wê demê serokê partiyên ew fersend xistin ser sîkeyan, wînda bûn, gava 19.04.1991 bi rev çûn Bexdayê û Sedam maç kirin. Di wê demê de hemû dinya dijminê Sedam bû, bi tenê desteyek nebûn, ew jî serokê partiyên bûn. Ewê ku bi wan jî dihat kirin bi tu kesê din nedihat kirin. Ew jî di sa anîna kêşeya kurd bû bo pêş dagirkerên Kurdistanê. Vê windabûnê jî tu car nedikarî bimeşe, heke li ser du sîkeyan serek nîn bûya; sîkeya kesk (YNK) û ya zer (PDK). Dema ku li ser sînor rojê hezar

tune ne. Wê desteyê bi giştî li derveyî welat bi xwe her hilgîrê heman çandê ne ku li Kurdistanê xerabî bi wê kulturê tî kirin, ji bo wê jî nikarin bibin ew destê ku karibe desta din rabigire. Bi tenê çêkirin li hemberî partiyên nade selmandin ku tu bi xwe tiştê din î. Partî jî dema ku mezintirîn karesatê bi ser gel de tînin, ji bo wan ne girîng e. Ku komek (nexwendê û xwediyê diploma) rexneyê li wan bikin û amojgarî ji wan re bi rêkin. Wan hewlên ku min dîtîye, ji wê çarçoveya ku kultura partiyên jê re xeta sor kişandîye, derneketine. Ew bas jî wê dikin ku partî ber bi ku ve bifirin, lê nabînin ku ewê ku ew dixwazin pê bifirin traktor e ne firoke ye.

Gelo dikare çî bê kirin ji bo ku rola rewşenbîrên kurd giraniyek di dinyaya siyaseta kurdî de çêbike?

● Rewşenbîrî û giranî çêkirin di dinyaya siyaseta kurdî de girêdayî hev in. Heke me yê tekstnivîs nekarîbe giraniyekê di dinayaya siyaseta kurdî de çêbikin, me nikariye ku bidin selmandin ku em rewşenbîr in. Vêca ho (sedem) ne girîng e, kêmasiya mirov bi xwe ye an ya civakê ye. Qiseyên me li ser hebûn û tunebûnê ne.

Di nav wan nivîskar û xwediyê diploma de ku ez wan dibihîzim an berhemên wan dixwinim, baştirîn mînakên paşverûti û bêtamî dikeve pêş çavê min, ew nikarin li derveyî partiyên tu giraniyekê din çêbikin, piraniya wan bi partiyên re bi tenê problema wan a teknîkî heye.



Rêberan sozeke siyasî û civakî
"Rizgariya Kurdistanê û xizmeta mirovê kurd" dan. Ji bo vê yekê jî gel piştgirî û qurbanî xwestin. Gel ev daxwaz bi cih anî. Lê rêberan soza xwe bi cih neanî.

Di nivîsa dawî ya we de ku li Swêdê jî, di semînerê de hat pêşkêşkirin, hûn tîrêjê dixin ser wê mijarê ku kurd heya niha di danûstandîneke bêkontrakt de bûye. Hûn dikarin zêdetir li ser vê mijarê bisekinin da ku xwendevanên me zêdetir jî ve mijarê agahdar bin?

● Li gor lêkolînek ku min çêkiriye, nexweşî bêkontraktbûna mîletê kurd e û derman jî teoriya kontrakt e.

Di sala 1961'ê de li Başûr bizava çekdarî dest pê kir, rêberan wekî aliyê yeke-min mil dan sozeke siyasî û civakî "Rizgariya Kurdistanê û xizmetê mirovê kurd".

Ji bo bicihanîna vê armancê dawakariya wan jî gel piştgirî û qurbandayîna bû. Gel wekî aliyê duyemîn dawakariya wan bi cih anî. Lê belê rêberan soza xwe bi cih anîn? Nexêr. Sala 1964 PDK bû du beş ku bi Melayî (alîgirên Mela Mistefa) û Celalî (alîgirên Celal Talabani) hatin nasîn. Ji vir û pê ve bizava çekdarî ket ser xeteke dîrokî. Bi şeweyê ku ez bi nav dikim: Dîroka ber bi jêr, serokê tîkçûyî.

Celalî çû cem hikûmeta Iraq û Melayî çû cem hikûmeta Îranê. Celalî di sala 1970'yî de û Melayî di sala 1975'an de aşbetal kirin. Heya niha jî ew dîrok di bin serokatiya heman destê de, li ser he-

man xetê dimeşe. Ji aliyekî ve ku di sala 1964'ê de dest pê dike, çar salên otonomiyê jê derxîni 1970-1974 heya niha li ser hêla (xetê) negetîv dimeşe, ku tîjî ye bi karesatên wekî Şerê Hekarî, Helebce, Enfal, rev, şerê hevkuştinê û îxanetkariyê. Li vir pîrsa felsefî ya siyasî ev e; çima dîrok, dîroka tunebûn û çêkirina serokê tîkçûnê ye? Zelaltir, çima kurd nabê hîç (tu tiştê)? Bersiv li nik min ev e:

Dema serokên partiyên sozên xwe bi cih neanîn jî, ew hatin qebûlkirin. Yanî ew bi xwe bi wan karesatên anîn serê kurdan re tune nebûn. Ev jî dide xuyandîna ku gelê kurd wekî aliyê duyemîn ku canê xwe dide, tu merceke wê li hemberî wê qurbanîdanê de nîn e. Bi vê re jî eşkere dibe ku kurd mîletê bê kontrakt in. Yanî mîletê bêkontrakt, ev mîlet mîlet e ku kontraktek nîn e di navbera her du aliyê de; Aliyê desthilatdar û aliyê xelk.


Desthilatdarên wê xwediyê hikmê reha (mutleq) ne. Ew biryarê didin û xelk jî girêdayî biryarên wan e. Ev girêdayîbûn jî, dike ku xelk bibe milkeç (mutî) û hemû tiştan qebûl bike.

Rêgeçare (çareserî) çî ye ji bo ku kurd ber bi başiyê ve gav biavêje kar û xebatên xwe bê kontrakt neke?

● Rêgeçare bi çêkirina teoriya kontraktê ye, bikaranîna derman bi xwe ye, ev jî bi du şeweyên serekî dikare jê re kar were kirin:

Şeweya kulturî ku di karên mîna belavkirin, qisekirin û qeşepêdana zanyarî de xwe dide nîşandan, ji bo vê jî belavok, rêxistin û sazî pêwîst in. Ev proseş dirêj

Helbesta kurdî ketiyê bin erkeke ku ne karê wê ye. Yek ji sedemên vê yekê tenêtiya helbestê, yanî tunebûn an qelsiya şeweyên din yê nivîsînê ye. Tunebûna azadiya çapemenî sedemeke din e.



ku gelek an aliyekî karê wî bi şer bikeve. Lê di nav vê karesatê de, karesateke din jî heye, ku birîtiye jî; ji xeynî xerabi-yê şerê peyameke siyasî jî tune be. Ev şer e ku partiyên Başûr didin meşandin. Yanî bi hevokeke din, ew şer ne şerê di navbera eniya demokratî û eniya diktator, eniya welatparêz û eniya çav, eniya nûjen û eniya paşverû de ye. Şerê navbera du hêzên desthilatê ye, ku gelê kurd û kêşeya wî ya neteweyî tî de wînda dibe.

Plana hilgirsandin û vemirandina şer li derveyî Kurdistanê ye. Partiyên bi tenê dema ku hêzên biyan hevgirtin li ser wan kirine ferz, hev girtine. Ewê ku dimîne jî ew e ku bêgane şer bi wan dide meşandin. Ew li benda yek ji wan du egeran in.

Bo nimune, di sala 1987'an di dema şerê Iraq-Îranê de, siyaseta serbazîya Îranê jî bo tijîkirina valahiyê serbazî li Kurdistanê hevgirtin bi wan da qebûlkirin û Bereya Kurdistanî hat çêkirin.

Di sala 1991'ê de ku kêşeya kurd piştgirîya cihanî lê dihat kirin, ew bi ref şandîna Bexdadê nik Sedam, ji bo ku wê pêla piştgirîne tune bikin.

Ew şerê ku ji aliyê wan ve tî meşandin, şerê welatan e, şerê bêgane ye li dijî hevûdin, an li dijî kurdan bi xwe. Ev şerê dawî tam didin xuyakirin ku dijminê

zarok dihatin kuştin, wan jî cem Sedam berê xwe dan dinyayê û gotin: "Em parastina tu kesî naxwazin." Lê ku Amerîka û hevalbendên navçeya parastî çêkirin, êdî divê li nik me ne tiştê seyr (ecîb) be ku ji bo dijayetîkirina wê navçeyê parastî ew dest bi şerê hevkuştinê bikin. Heya di dawîya wê qonterata xwe de, yek ji wan biçê rejîma Helebce û Enfal li Kurdistanê vegevine û yek jî Kurdistanê vala bike.

Li derveyî welat komek rewşenbîr heye, çima heya niha bandora wan li ser bûyerên Kurdistanê çênebûye?

● Siruştê partiyên ne ew e ku rewşenbîr bikare bandor li wan bike. Partî bi çek û bi pere bi rê de dimeşin, çek û pere jî li cem welatan e. Karê wan bi 'aqil' neketiye, tiştê ku ew dixwazin bikin, ewe ku kirine û tî de jî bi serketî ne. Ger tiştê din jî wan hevî bikin, şasiya me bi xwe ye. Ew ku amade ne ku serokê wê perlemanê ku gel jê re deng daye bi hêsanî bikujin, bêyî ku lê guhdarî bikin, bizanin ka çî dibêje. Êdî ewê çawa rêz bi wê nerînen kesên din nîşan bidin. Tiştê ew e ku dimîne rewşenbîr xelk bi rêxistin bikin û li hemberî wan rawestin, ev jî li rastê de nîn e. Deqnivîs û xwedandiblomayên me hene, lê rewşenbîrên me

Wêjeya zimane kurdî



XURŞÎD MÎRZENGÎ

Wêje serbilindahî û serfiraziya xelkan e. Xelkên bi wêje an şexsên bi wêje, bi rûmet û bi paye ne. Xelkên din cihê wan dizanin, rûmet û paye didin wan û xatirê wan digirin. Lê kesên an xelkên bê wêje, ne kesekî paye dide wan, ne rûmeta wan digre û ne jî xatirê wan dizane. Dibe wekî tirkên û dewleta wan. Îcar çaxê mirov bi wêje be û endamê xelkekî bi wêje be, mirov jî nava civateke bi wêje derkeve, mirov kane berhemên wêjeyî jî bîne holê û xwe bi xelkan û civatan bide nasîn. Yanê wêje ew tişt e ku êş û huner di nava wî de, di hundirê wî de veşartî ye.

Wêje çi ye? Wêje xweş û şîrîn axaftin, stranên û nevisandina e. Wêje bi zanîn tevger e, bi edeb rabûn û rûniştina, li miqabil mezinan bi tore û bi terbiye bûne. Mirov li hemberî bavê xwe, diya xwe, apê xwe, kekê xwe, xwişka xwe û lêzim û civata xwe biwêje dibe. Lewre ev mirov, mezinên mirov in, ên rîya rastiyê, rîya qencyê nîşanî mirov didin ew in... Civata ku mezintî û piçûktî tê de tune be, mezintî û piçûktî jê rabe, ew civat wêje û toreyên xwe wînda dike û civat wêran û kambax dibe.

Çaxê mirov bangî yekê bike, pêwîst e ku mirov di şûna tu de "hûn" bibêje, an jî "we" bibêje. Heke diya mirov, bavê mirov an mezinêkî/e mirov bangî mirov bike, pêwîst e ku mirov bersiva wan bi "lebê" bide û bi "belê" jî deng bide. Çaxê mirov ji mala xwe ji civata xwe wêjeyekê baş bigire, bi yekî biyan re têkiliyên mirov çêbin û mirov bi wî re bi xivê pêwîst e ku mirov bi wêje û bi pîvan pê re bi xivê, da ku ew mirovê biyan xelkê mirov û mirov bi şeweyekî wêjeyî nas bike. Ji bo nasîna xelkan şexs girîng in. Gava Yekî biyan endamêkî xelkekî nas bike, heke ew mirov qenc be, bi wêje be, bi çavê qencyê; bi çavê başiyê li wî xelkî dinêre û jî wî xelkî hez dike. Heke ew mirov nebaş be, bê wêje be, bi çavê nebaşiyê, bi çavê bê wêjeyiyê li wî xelkî dinêre û jî wî xelkî bi dûr dikeve.

Wêje serbilindahî û serfiraziya xelkan e. Xelkên bi wêje an şexsên bi wêje, bi rûmet û bi paye ne. Xelkên din cihê wan dizanin, rûmet û paye didin wan û xatirê wan digirin. Lê kesên an xelkên bê wêje, ne kesekî paye dide wan, ne rûmeta wan digre û ne jî xatirê wan dizane. Dibe wekî tirkên û dewleta wan.

Îcar çaxê mirov bi wêje be û endamê xelkekî bi wêje be, mirov jî nava civateke bi wêje derkeve, mirov kane berhemên wêjeyî jî bîne holê û xwe bi xelkan û civatan bide nasîn. Yanê wêje ew tişt e ku êş û huner di nava wî de, di hundirê wî de veşartî ye.

Ê me kurdan, wêjeya me ya devkî û civakî ne hew çend li para ye... Ji bo ku em xwe û wêjeya xwe bi cihanîyan bidin nasîn, sed heyf û mixabin wêjeya me ya nivîskî bi misas û werisan li paş wêjeya xelkên biyan maye. Nivîsên kurdan ên wêjeyî jî tûrik û kişikên bav û kalan nehatine derxistin û li pêş çavên biyanan, li ser mehfûra cihanî nehatine ra-

xistin.

Helbet sedem û asteng gelek bûne û niha jî gelek in.

Zimane kurdî xweş û şîrîn e, berfireh û tewangbar e. Pê xweş û qenc wêje dibe. Zimane tehdar e û mirov kane bi zimane kurdî mişkekî bike gergedan û filekî jî bike kurmikekî û di binê erdê re bike. Bi zimane kurdî û bi wêjeya kurdî pesndana keçikekê:

"Min wê rojê keçikek li Erdîşê, li qeraxê Derya Wanê dît, min ji çavên xwe

Esmayê û Camê Cem da destê min. Yeka çiqas tu bibêjî sipehî, bedew rind, xweşik, delal, çeleng û lewend bû û hemû xal û xêzên rindî û bedewiyê pê re hebûn. Yeka perî, nazik û nazenîn bû. Çiqas narîn bû, çiqas kubar bû, çiqas bi wêje u xweş meşan bû. Çaxê bi rê de diçû, wekî werdekeke ji avê derê û li mîrga kanî bimeşe, wey serê dayê bi gorî, zavayê wê bi xulam û serê mezinê Erdîşê bi qurban be. Rindiya Belqîsayê li ber bedewtiya wê gac dipêçan û lûlik hildi-



bawer nekir, ez lê heyirî û matmayî mam. Yeka temtêla wê bilind, bejna wê zirav wekî nêrgîza yek ta, porê wê qandê du werisan dirêj û badayî, biskên wê yên şê, wê poza wê ya belik ji dindanê kewê, wan çavê wê yên reş û belek, birûyên wê yên qeytanîn, wan lêvên wê yên ji rengê gulê, wan diranên wê yên mircanîn, ez birim asîmanê yekem cem

kirin. Meyrema îmranî kanibû ava wê ya desmêjê jê re germ bike, Valetîna kanibû pê re hevaltîyê bike û bi hev re herî Giravên Qanarya û bi hev re bikevin Derya Okyanosê, mirov jî ber van şerm nedikirin. Zîna Zêdan kanibû ceyzên wê yên bûkaniyê hazir bike û bibe şoşmana wê. Min bi xwe kanibû bi meşînê av li destên wê bikira... Temarê bajari-

yên Erdîşê derketibûn devê eywanan, bak û şaneşinan, devvekirî mabûn û jê li çepikar didan. Wan hinarokên sor spî, wî rengê şeylo, gaza gerdenê, sing berên mehfûrîn, ew temtêla ferfûrî, tiliyên narincî, ew newqa zirav wekî la belalûgê, wan her deh nenûkên oje rî, ew gerdana binê qirikê, wekî çiftes sa hevrişimîn, xal û xetên li balê, ew tanê etlesî û wan guharên heyderî, mirkanibû wê nazdarê jî dêla welatê lîlê loloyan bişanda Madagaskar hember bedewên Cîhanê. Ne tenê bi raya me sedî sed wê ji kurdan re xelata bedewrîn a cîhanê baniya Ez bi gorîya wê me şî, yeka wekî kewa gozela gogerçîn bi-

Fermo bi vê wêjeyê çi nabe? Ne te çîrok û roman, mirov kane bi çîdan wanan pê binivîsîne.

Li cîhanê heke xelkên biyan mirov pirtûkên dîrokî û erdnîgariyê an ansîkpedî û siyasetê nas bikin, xweşikî û şîniya mirov nabînin û mirov baş nas bikin; mirov nas bikin jî kêfa wan ji mirra nayê. Lê çaxê berhem û romanên mirov ên edebî û wêjeyî hebin û biyan wê biwînin, hem mirov baş û xweşik nas kin û hem jî kêfa wan ji mirov re tê.

Min bi xwe Spanya û sipanî bi Spantantes nas kirin. ūrisî bi Gogol û Çex nas kirin. Îtalî bi Pozo nas kirin û frajî bi Hugo nas kirin.

Mebest û mexseda me ew e ku zimane kurdî, zimane wêje ye û wêjeyî ye. Dewlemend e û bi sînonîm (hemwate) e. Çaxê mirov di hevokê de bawer yekê bibêje, heke ew bêje li wê hevokê xweş û şîrîn neyê, mirov kane bêjeyê din ku ew jî wê wateyê dide pêk bînin wê hevokê şîrîntir û tehdartir bînin. Dewlemendiya zimane wêjeya kurdî yek jê ew e ku tê de sînonîm gelek in. diduwan, zimaneke tewangbar e, tê wandin, tê xelandin, tê badanê û tê vaştinê. Yanê zimane wêjeya kurdî wêki tûrekî xirtik a ter e, tu xwar bikî xwar dibe, tu bitewînî ditewe. Bi hêsaniya zaxkek jî kane pê helbestan binivîsîne, jî rokan re kêrhatî.

Hela ku mirov pê roman binivîsîne wê Hezretî Yehya jî û Hezretî Îdrîs jî qatên asîman dakevin xwarê û zimane kurdî hîn bibin, da ku bi zimane kurdî roman dixwînin...

Astenga li ber wêje û romana kurdî ya herî mezin nelêxwedîderketina xwe ye. Ji xwendina zimane wêjeya kurdî kirîdar nîn in... Kula dil ji ew e.



Li navendên çandê çalakiyên ve hefteyê
Li Navenda Çanda Mezopotamya Stenbolê

- 20.04.97 **Yekşem**: Konsera Koma Agirê Jiyar, saet: 14.30
- Şahiya dengbêjan: Abdulbakî Şenser, Hozan Cemil, saet: 18.00
- 21.04.97 **Duşem**: Konsera Koma Amed, saet: 14.30
- 23.04.97 **Çarşem**: Semînera Enstîtuya Kurdî 'Li nav kurdan, lêkolînên akademîk û zanistî', saet: 18.00
- 25.04.97 **Fr**: Filmê belgeyî yê Ismail Beşikçi, saet: 18.00
- Li NÇM'ya Îzmîrê
- 21-27.97 : Pêşangeha Wêneyên Zarokên NÇM'ya Îzmîrê

- 24.04.97 **Pêncşem**: Konferansa Naci Kutlay 'Li nav kurdan kêşeya nasnameyê', saet: 18.30
- 25.04.97 **Fr**: Panela Pêşveçûnên siyasî û çapemenî: Rojnâmeya Aazadiya Welat (Ferec Çobanoğlu), rojnâmeya Demokrasi (Müstüm Yücel), rojnâmeya Emek (Remiz Sağlam), rojnâmeya Hêvî (Ali Polat), saet: 18.30
- 26.04.97 **Şemî**: Roja xwarinên kurdan yê kevneşopî, saet: 18.30
- Li BEKSAV'ê
- 26.04.97 **Şemî**: Forum II: '1 Gulan' Çetin Uygur, Siyamî Erdem, Atilay Ayçin, M. Pekgüleç, Ali Arslan, Halil Akçay, saet: 17.00
- Pêşangeha wêneyan 'Gulana 96'an ji bir nekin' Mehmet Özer, Tülin Dizdaroğlu, saet: 19.30

AWIR

Şanogerê Ege Sanat Tiyatrosu Serdar Aygun:

Dixwazim lîstikek kurdî jî bilîzim

**Malzeme têkeve
destê min û sazî û
ronakbirên kurd jî
piştgirî û alîkariyê
bidin min, ezê ser-
hildana mirovê
kurd bi awayê
şanoyî bînim ber
çavan. Ger ez bis-
erkevim, şerefek
mezin e ji bo min.**



Di 5'ê meha avrêlê de, li NÇM'ya Îzmîrê listika bi navê "Destana Şêx Bedredîn" hat listin. Ev destaneke pir xweş e, lê mi-xabin ji hêla gel ve xuya ye ku baş nayê nasîn. Di nava temaşevanan de jî xebatkarên NÇM'ê pê ve tu kes zêde tune bû. Mi-jara listikê bi kurtasî ev e: "Li Anatoli-yê Şerê Çînî yê yekemîn e ku bi teorî û karwanîyê ve hatiye kirin. Serhildana gundiyan a herî mafdar e li hemberî dewleta Osmanî û berxwedaneke çînî ye bi rengê xwe. Şêx Bedredîn tenê pergala jiyaneke hevpar neparastiye, bi xwe, bi rêk û pêk şerê wê jî daye.

Bi saya vê listikê em bi şanoger bî-rêz Aygun re peyivîn. Wî got: "Ev e 17 sal e ku ez vî karî dikim, 12 sal e jî bi profesyonelî dixebitim." Ew demêkê bi Tuncel Kurtiz re jî xebitiye. Taybetiye-ke wî heye, şanoyên xwe bi tenê dilîze. Me ev jî pirsî, wî jî wisa daxuyand: "Taybetiya listikên min ev e, dema ku pergala civakî hildiwêşe an dest ji hev belavbûna wê dibe, mirov jî li dijî. Vê pêvajoyê serî hildide. Belam mijar, serhildanan mirov e, divê bi tenê bê listin."

Di listikên wî yê din jî de, wekî "Bay-2 (Birêz 2)", "Ben insan (Ez mi-

rov)", "Tutunamayanlar (Yên ku bi ser neketine)", Oza (nivîskarê Uris) heman tema hatiye bikaranîn.

Li ser pirsê me ya 'Listikên we yê li ser kêşeya gelê kurd hene?' şanovan Serdar Aygun wisa got:


Na, mixabin. Heta niha listikek min wisa pêk nehat. Ev kêmasiyek e ji bo min. Lê ez amade me jibo gelê kurd xebatekê pêk binim. Malzeme têkeve destê min û sazî û ronakbirên kurd jî piştgirî û alîkariyê bidin min, ezê serhildana mirovê kurd bi awayê şanoyî bînim ber çavan. Ger ez bi ser bikevim, şerefekê mezin e ji bo min. Di pêvajoya pêşiya me de (wekî mehekê) listike-ke min a bi navê 'Otel Madimak' wê bê ser sehnê. Di nava vê listikê wê de temayekê kurd jî hebe.

Şanoger Aygun, ku niha li Îzmîrê dijî, tevî jina xwe "Ege Sanat Tiyatro-su (Şanoya Hunera Egeyê)" damezi-randine û xebatên xwe bi profesyonelî didominin.

FEREÇ ÇOBANOĞLU

TÎŞK

BEKIR BAHÖZ



Pêşkewtinekanî Başûr

Çend rojî rabirdû wefdêkî payebilindî Amerîka, le çiwarcêwey têkaşan da bo ragirtinê şerî nêwan Yekêti Nîştîmanî Kurdistan (YNK) û Partî Demokratî Kurdistan (PDK), serdanî başûrî Kurdistanî kird. Wefedekey Amerîka, lêpirswarêkî wezaretî derewey Turkiyan legel bû.

Wek dezanrê, Wezîrî Derewey Amerîka Madeleine Allbright, maweyek le mewber, le witarêk da ke le Zankoy George Tojn pêşkêyî kird, legel amaje bo siyasetî Amerîka dij be Iraq, pencey bo rewşî başûrî Kurdistanî rakêşa. Allbright wî: "Amerîka sûr e le ser dabinkirdinê aşî le bakûrî Iraq."

Yek hefte diway wîtarekey Wezîrî Derewey Amerîka, wefdêkî gewrey ew welate serdanî Başûrî kird. Eger mirov serinc bidat debînet le diway dagîrkirdinê şarî Hewlêr le layen supay Iraqewe, carî yekem le lêpirsirawêkî payebilindî Amerîka ser le Başûr dedat. Hemû em pêşkewtinane, şan be şanî cêgirkirdinê hêzî saxtey be naw parêzerê aşî dêt le başûrî wetatî ême.

Helbet ziyaneke şerî nawxoy Kurdistan tenha kuştin û birîndar bûnî çend hezar pêşmerge û kesani sivil yaxud ziyani abûrî niye. Belkû em şere, le ser astêkî dûr ziyani be sercem bizûtinewey kurdî degeyênê; çî le başûrî Kurdistan, çî le beşekanî tîrî Kurdistan, be taybetî Bakûr.

Eweta Amerîka rolêkî mezin debexşet be Turkiye le kar û barî başûrî Kurdistan da, aşkira ye ke Turkiye berjewendî xoy dexate serû hemû berjewendiyek. Her boye ew welatê têkedoşet sîmay kurdî le başûrî Kurdistan damalêt. Helbet seretay ew kare be gewrekirdinewey rolî Turkmanekan dest pê dekat.

Amerîka bo xoy be raşkawî radegeyênê ke siyasetî xoy le herêmeke şan be şanî Turkiye piyade dekat, Turkiyêş lawazbûnî berey kurdî be helî dezanê û zor be asanî mercekanî xoy be ser rêxistine kurdiyekan da desêpênê.

Her diwa be diway geranewey Wefdî Amerîka, PNK û PDK rayangeyand ke her du la, pabend in be xalekanî rêkewtinî Enqere we, emêş be watay sipardinî berî rencî deyan saley gelî kurd e be kemîneyekî wekû tirkiman ke Turkiya bo meramekanî xoy be kariyan dênê.

Be her hal, erkî hêze demokratî û nîştîmanperwerekan lem roje da, aşkirakirdinî û perde ladan e le şer game û nexşekanî Turkiye le başûrî Kurdistan. Her weha her hêz û layenekî kurdî hawkarî ew welate bikat le cê be cê kirdinî pilanekanî da, bêgûman be mêjû û xwênî şehîdan lêpirsraw debêt.

Tenya rêgaş bo berengarbûnêwê û pûçel kirdinewey game û nexşekanî Enqere, hawkarî û hawdengî rêkxawekanî kurd e legel yek da, nek dujminayetî kirdinî û senger le yek girtin.

“Her” Komutan cerdevan

Himûd û kurê wî li nava zeviyê eşêfa niskan dikirin. Dîsa ji bo pêserojê ketibû xeyelan. Beriya çend salan pir çeleng bû. Çil rêvî di serê wî de berê hev û din didan, teriya yekî li yê din nediket. Lê van salên dawî de ne rêvî di serê wî de mabûn, ne jî teriyê wan diliviya. Her tişt tevî hev bûbûn.

Bi dengê kurê xwe çeng bû, nihêrî li serê zeviyê aliyê din sê zilam xuya bûn. Hêdî, hêdî ber bi wan dihatin. Berê pêşin Himûd got qey rêwî ne, di riya xwe de diherin. Lê her ku nêzikî wan dibûn hûn baş dihatin naskirin. Serê tivingên wan xuya dibûn. Wisa fêm kiribû ku cerdevan in. Hinekî xof pê re çêbûbû, lê nedixwest kurê wî pê bihese. Digot: “Ew jî ji gundê me ne, ma wê çi bikin ji me? Hebe hebe ew Nicoyê. Hemreş e.”

Nico bû. Dema nêzikî wan bû got:

– Siz ne ariyor burde? (Hûn çi digerin li vê derê)

Himûd:

– Ma em çi dikin bavê min, hûn nabînin em eşêfê dikin?

– Ben size demedi bendan izin alacak? (Min negot hûnê destûrê ji min bistînin)

Himûd bihekê sekinî û fikirî. Nico gundiyê wî bû û di emrê kurê wî de bû. Gelek carî li cem hev rûniştibûn û bikêf û henek peyivibûn, bi bavê wî re jî heval bû. Cerdevanî jî peji-randibûn. Kurê Nico çiqas digot: “Bavo ev cahşî ye, xayintî ye.” Qet di serî de nedîçû, wî digot:

– Ê helbet wê ji aliyê dewleta xwe bin, ma ev xayintî ye? Çend heban ra-hîştîye keleşa dibêjin emê dewletê xera bikin. Ma hûn karin lawo? Ma ne di bin Xwedê re dewlet e. Ma qey ketiye serê we? Ma Xwedê qebûl dike lawo?

Dikir û nedikirin nikarîbûn bi serê wî bixin. Lê belê nok li serê wî jî ketibû êdî. De ka wê çi bersivê bide Nico?

Nico:

– Yahoo Himûd niye soylemiyor? (yaho Himûd tu çima nabêjî?)

– De niha bi tirkî jî zaniba.

Nico dîsa:

– Çabuk söyle (zû bibêje).

– Ma em li çi digerin bavê min? Ma



qey ev jî hawe ye? Ma em ne gundiyên hev in, em ne mirovê hev in, qey tu min nas nakî Nico?

– Tırçe koniş lan, tırçe koniş (bi tirkî bipeyive kuro, bi tirkî bipeyive)

– Hela, hela.. kuro ma heta niha li ku qala we dikirin, ez li hemberî wan derdikeitim. Min digot ew baş in. Îca ev çi ye ez di bextê te de me.

– Lan Himûd soyleme Nico, soyle qomitan.

– Tu jî xwe re li min û li vî kurê dahşikê binêre loo, îca qomitan çi ye?

Şaş û metal mabû Himûd. Bîra mirina xwe dikir, bîra Nico û bibe qomitan nedikir. Qet bi serê wî de nedîçû. Di ber xwe de digot: “Ev heta doh li kuçan zarokan tilîk tède hildidan, îro bibe komutan.” Wî digot û baweriyêke mezin pê-

dianî ku komutan gişk xwende ne û hin ji wan jî welî ne. Ji ber wê yekê jî digot: Weleh îcar wê dinya xera bibe, Nico û komutan?

Tim jî difikirî. Nico jî di ser de dipeyivî, ew jî ji xwe re difikirî digot, ‘Ge-lo Nico ji bo çi wiha dike, ev mabesta wî çi ye?’ Carekê dîsa rêviyê serê wî teriya, xwe livandibû û nexweşiya ku di nava wan û malbata Nico de çêbibû hate bîra wî. Carekê li hevûdin xistibûn, pev çûbûn. Wê demê malbata mala Nico êşiya bû. Digot qey Nico îcar hatiye tola xwe.

Hemû hêza xwe kom kir û berê xwe da Nico û got:

– Bende jî û sende jî em hemû di devê xwediyê tivinga te de ne.

– Hêdî, hêdî kuro weleh ezê li te bi-

xim ha!

Êdî bi kurdî dipeyivî Nico. Çend devokên wî bi tirkî hebûn, ew jî qe-dand li ser vê zeviyê, wê çi bike rebeno?

Himûd:

– De wê de here loo, min got qey tu zilam ??

Weleh heke dewlet ji te ne xerabtir be, tu nedikirî komutan. Min got qey tu mêr î loo.

Bi vê peyvê re şeqamêk li rûyê wî ket.

– Sas dûriş, sas dûriş...! (Amade be!)

– Hela hela ev çi... xwayî ye, ev çi qesmerî ye Nico?

Nico carinan jî berê tivingê bi Himûd ve dikir û digot:

– Weleh ez niha dikarim we bikujim haa.. û ezê herim qereqolê, ezê bibêjim min teror kuştîye.

Himûd bihêrs:

– Ê de me bikuje lo, ma çi maye êdî? Jixwe te ez kuştim. De tê çi bikî bike qurban.

Hişê Himûd bi van peyvan re tevî hev dibû. Tiştên difikirî li ku, tiştên diqewimîn li ku? Berê ji camiyê (mizgef-tê) mabû êdî ji dêrê jî hêdî hêdî bi dîr diket. Ji mecbûrî stuyê xwe xwar kir û Nico çi got wekî wî kir.

Nico berê Himûd û lawê wî da qereqolê. Ew birin ba serbaz û çî di navbera wan de derbas bûbû herî jî serbaz re gotin. Qomitan jî

bi hêrs rabû ser xwe û berê xwe da Himûd got:

–Lan ma qey ev şivanê golikan e? Tu çima bi ya wî nakî? Çima tu bêdestûra wî çuyî zeviyê?

Himûd:

– Komutanim, ma min çi kiriyê? Weleh heta niha min li dijî dewleta xwe tu tiştê nekiriye. Mijara destûrê jî min nizanibû.

Himûd êdî di ber xwe de dipeyivî, lê bi awayekî din. Digot: “Hey hat û hey çû. Nico bûye komutan, cihê me nema li Cizîra Botan.” Bi destê kurê xwe girt û berê xwe dane malê. Bi rê de jî kurê xwe re digot: “Ez zanim kurê min ez zanim êdî ezê çi bikim. Îcar dora min e.”

ÇIYA MAZÎ

Ji baxçeyê helbestên kurdî du pirtûk

Digel rewşa kambax a wêjeya kurdî wêjeyanên kurd dev ji xebatên xwe bernadin. Baxçeyê wêjeya kurdî bi berhemên xwe dixemilînin. Kurdên li seranserê dinyayê, guh nadin dek û dolabên dagirkeran û ji bo geşkirina vî baxçeyî çî ji wan tê dikin.

Du berhemên ku em dixwazim qala wan bikim, du pirtûkên helbestê ne.

Seyrana Dil

Yek ji wan pirtûka M. Hemo ya bi navê "Seyrana Dil-Dî şîna Evîna De" Ev pirtûk ji nav weşanên Pirtûkxaneya Bedirxan li Helebê derketiye. Pirtûk ji du kesan re wekî diyarî hatiye pêşkêşkirin:

Şivan Perwer û Leyla Zana.

Helbestên M. Hemo bi zimanekî gelêfî û xweşik hatine ristîn. Bi piranî li ser rewşa welat, li ser keser û axîna mirovan û li ser evîna dilan in.

Helbestvanê kurd bi van gotinan xwe dide nasîn:

*Ji welatê ku ala xwe li xwe nekiri
Ji çiyayên ku hêvî tède venemiri
Ji gundê ku welatparêzan avsînkiri
Ez daketim govenda wêje û min di vê berhevê de dîlan xwe gerand bi helbestên nuh û kevin...*

M Hemo sedema helbestvaniya xwe jî di helbesta xwe ya bi navê "Eger" bi van gotinên xweşik tîne zimên:

*Eger
Eger ez nanek bama...!
dîvê min rojekê,
zîkekî birçî,
têr bikira,
lê, roja din
wê bîma birçî*

*Eger ez xewnek bama...!
dîvê min şevêkê,*

*hêviya dildarekî,
ava bikira,
hema bi sibê re,
dibûm derewçî.*

*Lê eger helbestek bama...!
bi navê azadî,
bihatima xwandin,
minê we berda,
guhê yî milletî
Ji bîr nedibûm,
ta serbestî*

Di vê pirtûka M. Hemo de tiştê ku bala me kişand herêmîbûna zimên e. Ev yek li aliyekî zimanê helbest nêzî zima-

Hemo de jî balê dikîşînin. Bo nimûne, lêkerê kesê duyemîn.

Evîna Reben

Pirtûka duyemîn a ku em dixwazin li serê rawestînin, pirtûka Derwêş M. Ferho ya bi navê "Evîna Reben" e. Ev pirtûk ji nav weşanên Nûdemê derketiye. Wekî tê zanîn Derwêş M. Ferho Serokê Enstîtuya Brukselê ye.

Giraniya naveroka helbestên Ferho jî li ser welatparêziyê ye. Li gelek helbestên Ferho li ser welat, li ser azadiyê, li ser pêşmerge û li ser bîrîna kûr qetlîama Helebçeyê ne.

Her wiha helbestvanê kurd gelê baskî

*Hemû helbest nivîsî
Ji xwendevanan re pêşkêş kir
got kerem bikin, bi zimanê xwe
helbestên xwe li ser xwe bixwînin*

*Xwendevanan li helbestên Hemo nêrin
berepaş û serqunî hev kirin
tiştêk jê dernexistin
helbest berepaş dane wî û jê pirsin
'keko ew bi çî zimanî hatine nivîsin?
Alfabe ya çûka ye?!*


*Hemo got wan
na, na, ew Kurdî ye!*

*Ji hev re gotin
sûc ne sûcê Hemo ye
Lê gelek ji me weha ne
em dibêjin em Kurd in û xebatkar in
lê em xwe jî tesîra Tirkî û Farisî
û Erebi azad nakin birano
hê jî pîrr kesên me di cihê Kurdî de
bi Tirkî 'qonişmiş' dikin
û Erebi û Farisî bi kar tînin.*

Belê di helbestên M. Derwêş Ferho de doza neteweyî, azadî, baweriya bi hêza gel û evîna welat bi awayekî zelal xwe didin xuyakirin. Ferho hêza gel di helbesta yekemîn de bi van gotinan tîne zimên:

*Dengê gel
Dengê gel
bilind
û
bi kî e*

*Tev birin e
kê e
xencer e
û şûr e...*



nê gel dike, lê ji aliyê din ve dike ku helbest bi tenê li wê herêmê baş bîn fêmîkirin. Her wiha kêmasiyên rêzimanî û di nav gelê herêmê de hene, di zimanê M. Em û kurdî



jî ji bîr nekiriye helbesteke xwe jî diyarî wî gelî kiriye. Helbesta wî ya li ser zimanê kurdî rewşa me baş dide xuyakirin: Em û kurdî

SERWÎSA ÇANDÊ

Mişkên rewşenbîr

JAN DOST



Di quncêkî tarî de, ji mala rewşenbîrekî kurd du mişkan xwe vediparimandin, sîrkesîrka wan bû; qîlên xwe yên tûj, bi pencikên xwe yên nazik pak dikirin, mişko tariya xwe li zîkê xwe xist û ji jîna xwe Mişkê re got:

- Min di temenê xwe de ev qasî têr nexwariye.
- Erê bavo çima na, te îşev sê helbest ji diwaneke taze xwarine. Te ji birçîbûna salên berê re gotiye: Bi xatirê te!!
- Tu çima ya xwe nabêjî?! Te rûpela yekem ji rojnameya vê hefteyê bi tevayî xwar.
- Ax.. xwezî min nexwaribûya.. nivîsên tê de ne xweş bûn.. Kurteçîrok ji van rûpelên zer xweştirin.
- De nazikiyan neke tu jî, nayê bîra te berî çend salan, em ji birçîbûna dimirin, hindik mabû mişkên Kurdistanê, qir bibûna, spasiya xwe dê bike ku kurd êdî kitêban çap dikin, tu dibêjî qey dilê wan bi me şewitiye!!

- Na bî simbelên te yên xweşik ne wisa ye, berê xwendin hebû, xelkê kitêb ji destê xwe bernedidan, dixwendin me ji di qulên xwe de çavşkestî li wan dinihêrî. Xwedê wî zemanî veqerîne, emê ji naza bimirin.

- Amîn.. Amîn.. ev zeman pir xweş e. Kitêb gelek in, rojê deh kitêb çap dibin û bi hezaran, ji xwe rojname. Me bi wan kêfî kiriye, ji xwe belavokên partîyan ji nanê hişk jî xweştir in.

- Xwedê bide xortên kurd yên vî zemanî, ew me ji bîr nakin.. van pel û kitêbên delal û rojnameyên bi wêne tînin li mala xwe datînin, refikan pê dixemilînin. Deh sal di ser kitêbekê re derbas dibe, ji cih naleqê, ma nayê bîra te me di şevêkê de Mem û Zîn xelas kir?

- Çawa nayê bîra min, di nav qîlên me de pîrsûyên bextreşa Zînê şikestin.. Memoyê di zîndanê de jî hew naliya, me zengeloka wî jê re wek hev kir.

-Te dît çawa xwediyê kitêbê roja din hat nihêrî çî bi serê "Mem û Zîn" ê hatiye.

- Erê, û bi kerb ew ji ser refikê daxist û avête nêva-êgir û got: Ev çî kitêb in bavê min li min kirine bela yê xelkê bavê wan erd û milkan jî wan re dihêlin, yê min ev kitêbên riziyayî û zengirtî!!

- Ew xortekî bêaqil e, mejî di serê de nîn e, eger wî zanibûya ew kitêb çî qasî xweş in, wiha nedigot. Wê tev de li ber xwe danibûna û yek-bi yek bixwarana.

- De Xwedê kir ê wisa gelek in, ne berê

dibêjin: "Nanê aqilmendan ji kîsê kêma aqilan e."

- Îşev di vê kitêbxaneyê de, çavê min li romaneke-nû ket, ew roman bi kurdî ye, aqilê min nabire ev lawik tiştêkî jê fêm dike, ew bi xwe jî berga xwe xuya ye romaneke pir delal e. Fotografê nivîskar jî li ser heye, texmîna min ew bêhîrî du sed rûpelî ye, têra min-û te û eşîra me hemû dike..

- Êêê.. doza te çî ye?!

-Ez dibêjim çend hevalên min hene, ezê sibe wan a dawetî vê romanê bikim.

- Bi Xwedê ya te di cih de ye, çend cîranên min jî hene, ezê xeberê bidim wan, bila ew jî bîn.

Her du mişk di vê diyalogê de bûn, xwediyê malê nêzikî kitêbxaneya xwe bû, wan di cih de xwe veşartin û bitirs li wî nihêrîn, mêrik il ber kitêban rawestiya û di ber xwe de got: "Off, nizamim ev çî kitêbên befêde ne?!! Weleh ne jî şerma bûya min kitêbek jî ji destê nivîskarê wê nedigirt ev ne tu hal e!"

Her du mişkan biken û bêdeng li hev nihêrîn û hêdî hêdî derbasî qula xwe ya tarî bûn û jî kêfa re teriyên xwe li ba dikirin.

Jêrenot ji bo xwendevanan: Ez bî hêvî me ku hûn vî quncikî nêzikî qulên mişkên mala xwe nekin.

Komara gurê pîr



Komar wekî rêveberiya herî nêzî demokrasîyê tê binavkirin. Gelek cureyên komaran hene ku bi rengên rêveberên xwe ji hev vediqetin. Hinek ji wan navê îslamî li xwe dikin, dibin komarên îslamî, hinek piyaseyê ji serdestiya xwe re dikin rûpoşî, dibêjin komara bazara serbest. Hinek hebûn digotin komara gel, lê çend burokrat li ser keda gel bûn mexel

û firotin bi bazara serbest hêviya gel. Bi kurtasî, (belkî hinek bibêjin: "Kurtiya çî, halê çî" ew jî bi kêfa xwe ne.), di hemû komarên heyî de mirov bi destê birek serdest, tê melisandin. Yên ku ne melisandin, tîn fetisandin.

Di çirokên gelêrî de sistemeke heywanan jî heye, ger mirov wê wekî komar bi nav bike, ji gelek komarên mirovan zêdetir ne xerabtir e. Ji ber vê yekê

hinek kes peyva heywan wekî "high one" dinivîsin ku wateya wê "kesê bilind" e. Di nav pergala heywanan de rewşa şer bi piranî dişibe serekomaran (serekomarên resen, ne yên ku dişibin segê mamê Hesên), rovi aqilmend û kurtêlxur in û gur jî "hêzên ewletiyê" ne. Bi ehmeqiya xwe derdikevin pêş, pîrî caran şer berê wan dide kêş, ne dimîne keser û ne jî serêş (lewre seriyê ku biêşe namîne). Di tu çirokan de şer li ber gur serî natewîne, teriya xwe li ber wî nahêjîne.

Lê dema mirov bala xwe dide rewşa komara tirk kesên ku bi navê şer kar dikin ji gur re diçin şejdeyê. Lewre her tişt di destê guran de ye. Cur bi cur gur hene, wekî gurên çalak, gurên taybet, gurên medenî û gurên madenî... Beşek ji guran li bajaran kar dikin, beşek jî li gund û pesaran mirovan dixin parêza ewletiya can û mal. Li nav sistema tirkan gur di ser her tiştî re ne, lewre jî cejna wan ji ya her kesî xweşiktir tê pîrozkirin. Ez jî dixwazim ji devê serokgur bi helbestekê cejna wan pîroz bikim.

Cejna guran
Gurino
Gurên boz
Ne çêtir e ji cejna we
Nevrûz
Radimûsim her du çavên we

Dialêsîm binê lingên we
Radikîm kopalê serbigur
Di ser gel dikim bûrebûr
Çima dibêjin: "Gurê taybet zalim in
Gurê çalak bi çalim in
Gurê medenî xesûk in
Gurên madenî tirsok"
Dema mir gurê kal
Ji min re ma ev kopal
Ezê bigerinim vî aşî
Siwar bim li wî çaşî
Bo guran xweşî, geşî
Bo şer êşî, reşî
Bila gurên cur bi cur
Heta bigihê yê mizûr
Pîroz bikin cejna xwe
Rê bidin hunera xwe
Hevalbendiya xwe û segan
Bo aramiya me began
Di rojên pîr giran de
Di malbata guran de
Hebû gurekî boz
Ew ji me re bû qilawûz
Em ji wî hîn bûn daw û doz
Me jêkirin guh û poz
Me Newroz kire nevrûz
Gur ji me re bapîr e,
Hem axa ye, hem jîr e
Kî diwêre ji gurên min re bibêje
Di demokrasiyê de gel bi xwe mir e?

QELEMŞOR KOMARNAS

BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (64)

XAÇEPIRSA

Q	A	D	I	M	J	H	E	M	E	D
Z	A	R	H	E	M	I	N	I		
Ü	N	E	W	A	E	E	A	Y		
S	E	W	A	B	Y	A	S	H		
G	E	R	E	A	S	N	E	R		
D	R	A	D	O	N					
N	A	L	T	N	R	A				
R	Ü	A	T	R	E	M				
P	T	E	N	E	Ş	O				



Bersiva Xaçepirsa 62'yan

Xaçepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 64'an "Kolay Kürtçe"

KAMURAN RUFİH XAN

kolay kürtçe


Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Cewalek Siyasetva nê kurd (wêne)	Paqj Danîşe	Bi farisî av Pivaneke giranîyê	Delal Navekî jîna	Nexwest- yek Kurdîya MGK'ê	Çiya
				6	1
Kurtiya navekî			Riwin, rûn Ufq		Oksîjen Qelbin
Kurt		Berendam Dijî mê		2	Xwerde- paşê cinavka di
Dijî girinê			Hejmarek		
Notayek			Bizmar	Dev li...	Sazek
	Navekî Jinan		Pirsgirêk, arîşe		
	Sewalek		Sewzeyek		
Gilyayek			Kuçik		
Sembola kükürtê			Bajarekî Kurdistanê		
	Bi kirdîkî av	4	Damaran de digere Pivaneke dirêjîyê	3	
Dayik			Agir		Tipek
Rûştî					
					Fosfor



Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 62'yan Şerefa Windabû-yî ya Katerîna Blum qezenckirine. Bülent Bora/ Malatya, Seyid Özgül/ Bartın, Bestevî'nî Mutlu/ Mêrdîn, Zelal Aydın/ Amed

PEYVA VEŞARÎ





Hêrsa gel li Enqereyê teqiya

Li 13'ê avrêla 1997'an bi deh hezaran mirov li Meydana Kızılaya Enqereyê hêrsa xwe ya li dijî çeteyan û daxwaza aşî û demokrasiyê qirîyan.

Bûyera Susurlukê ku rûyê dewletê yê qirêjî û gemarî eşkere kiribû ku di ser re çar mehî zêdetir dem derbas bûye û hîn tu encam jê nehatiye sitandin, di ser de jî dewlet bi xwe ji bo ku tiştên eşkerebûyî bitemirîne xebata xwe didomîne û çeteyiya xwe berdeyam dike.

Ji bo protesto kirina ev helwesta dewletê Partiya Azadî û Hevgiriyê, (ÖDP) Partiya Demokrasiya Gel (HADEP), Partiya Aştî ya Demokratîk (DBP) û gelek rêxistinên girseyî yê demokratîk bêşdarî vê mîtînga protestokirinê bûn.

Li Meydana Hipodromê girse, bi vekirina pankartan û alan ketin rêzê û kortej çêkirin. Li pêşiya girseyê birêveber û li dûv wan jî endamên van sazîyan saet li 10,00'an ber bi Meydana Kızılayê ve meş dest pê kir. Girseyê herî zêde ya HADEP'ê bû. Girseyê HADEP'ê di rê de ta giha cihê mîtîngê dirûşme avêtin: "Kurdistan wê jî faşîzmê re bibe goristan," "Li dijî faşîzmê mil bi mil," "Enqere Enqere çeteyan veneşere" "Şehîd namirin," "Serok Bozlak rûmeta me ye," "Gerîla lê dixe

Kurdistanê ava dike".

Dema girse giha ber Zafer Çarşısı, bi hezaran gél bi avêtina dirûşmeyan tevî girseyê HADEP'ê bû.

Li Meydana Kızılayê piştî ku komên muzîkê cihê xwe girt, hunermendê navdar Ferhat Tunç bi stranên "Özgürlük mahkumları" û "Ciranê" coşa gel hîn zêdetir kir. Hunermend Orhan Aydın û Suavi jî stîrîn.

Serokê ÖDP'ê Ufuk Uras di axaftina xwe de got: "Çete, çeteyan leheng didin nîşan. Wê gelên kurd, tirk û yê din bi birafî û bi hev girtina xwe çeteyan û piştgirên wan darizînin." İro destpêka paqijkirina gemariyan e..., li pey wî jî cigîrê HADEP'ê Ahmet Türk jî got: Di avakirina Komara Tirkîyeyê de keda gelê kurd jî bi qasî gelê tirk e. Wê demê em birabûn, lê niha mafê jiyane jê re tune. Êdî kes nikare pêşiya gelê kurd bigire. Gelê kurd, aligirê biratiya gelan, aşî û demokrasiyê ye...", li pey wî jî nûnerên rêxistin û komeleyan axivîn. Hema bêjin tevayî axifgeran piştewaniya Serokê Giştî yê HADEP'ê M. Bozlak û rêveberên HADEP'ê ku bi awayekî neheq tînan darizandin kirin û gotin: Ew ne bi tenê ne. Mîfîng, piştî qedandina axaftinan bi awayekî asayî qediya.


ROŞAN LEZGÎN

Pîrozbahî

Bi hêviya cejnên ku em li welatê xwe bi awayekî azad û serfiraz pîroz bikin, em cejna qurbananê ya gelê kurd û hemû gelên misilman pîroz dikin.

Navenda Çanda Mezopotamyayê

Zevî distrê:
Bo baran
Çiya bo baz
Roj bo aso
Stêr û hîv bo herbang
Tu jî bo Kurdistan
Memo tu jî bo Kurdistan
distrî



Me heval Mehmet Karademir (8.4.1997) di ameliyeta dil de winda kir. Berpîrsê mirina wî sistema tunduristiyê ya dewleta tirk bû. Hevalê Mehmet wekî beden ji nav me bar kir, lê bir û bawerîya wî di tekoşina me wê her dem bijî.

Li ser navê xwendekarên welatparêz ên li Fakulteya Tîpê ya Cerah Paşa û Çapaya Zanîngeha Stenbolê Yezdan Niştîman

amojgarî: perwerdekarî
asanî: hêsanî, sanahî
aşbetalî: destvalayî
ayend: pêşeroj
belam: feqet
beyanî: sibe
bêgane: biyan (yabancı)
bizav: tevger, liv (heraket)
çewsandin: perçiqandin
dehbelor: ehmaq, debeng
demdemî: geçici
destkeftin: kazanım
desthilatdar: Serdest
dijberî: dijayetî, muxalefet
dîlî: hissî
êsta: niha
gelperwerî: hezkirina ji gel

Ferhengok

gerîde: erebe
helwest: tawir
helgesandin: nîrxandin
hinartin: şandin
jînenîgarî: biyografî
karesat: trajedî, faleket
keys: firsend
lasayî: taqlîd
lêl: şêlo, şêli (bulanik)
lêzim: meriv, eqrebe
mêjûyî: dirokî
mayînde: tiştê ku dimîne (kalıcı)
neguherbar: tiştê ku naguhere
neteweperest: şovenîst (milliyetçî)
pergal: sazûman, sistem, (düzen)

peyaman: mesaj, haber
peyamhinêr: nûçegihan
peywir: görev
pêjinkar: dıyarlı
qêşepêdan: pütêpêkirin (cidiye almak)
qise: peyv
qisekir: berdevk
Raperîn: serhildan
Pêzanîn: agahî
rêziman: gramer
surîşt: tebîat
wêje: edebiyat
zagon: qanûn
zerzilandin: pelîşandin
Ziver: eciz
Zor: pîr
Zorbe: gelek

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basım ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewrûpâyê:
M. Rojaya
Sûriye:
Jan Dost
Helim Yûsiv
Berlin:
Silêman Sido
49-30-69002695
Hannover:
Selim Biçûk
49-5721-81360
Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884
Bruksel:
Medenî Ferho
32-02-466037
Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564
Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49
Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Rewşenbîrê Rojhilatê Kurdistanê Ehmed Şerîfî:

Zimanê standard ê kurdî di Çêbûnê de ye

Bi baweriya min zimanê standard ê kurdî di çêbûnê de ye. Bi taybetî ji bo ronakbîran ev ziman çêbûye. Ezê dikarim baş kurmancî bixwînim, baş fam bikim. Hûn jî wiha ne, tu dikarî bi soranî bixwîni û fêm bikî. Zimanê standard bi zorê pêk naye. Pêwistî bi dostayetî, peywendî, kitêb û kovaran heye.



M amoste Ehmed hûn dikarin xwe bi xwendevanên me bidin naskirin?

Ez di sala 1945'an de li bajarê Mehabadê hatime dinê, Malbata min hejar û belengaz bû, ji êşîreta Gewirk. Bavê min karger bû. Ez hinaridim dibistanê, ez çûme dibistanê û min di edebiyata farisî de diploma stand.

Paşê ligel dost û hevalên xwe min xwe fêrî xwendin û nivîsandina kurdî kir. Ew kar jî wê demê û bi nehênî bû, çimkî xwendin û nivîsandina bi kurdî wê gavê qedexe bû.

Di çaxên genciye (xortanê) de min bi farisî tişt li ser kurdan dinivîsin û di kovar û rojnameyan de didan weşandin. Wê demê kovarên kurdî li Îranê tune bûn.

Gelo çî kar û xebatên we der barê edebiyata kurdî de hene? Berhemên we yê çapkirî û ne çapkirî, projeyên we çî ne?

Kake kar û xebatên min çar cure ne:
1- Cemkirin û komkirina beyt û serbûrî û keleporê kurdiya navçeyî Meha-

badê.

2- Nivîsandina gotar û meqale bi zimanê farisî ji bo kovarên Îranê.

3- Nivîsandina gotar û meqale ji bo kovarên kurdî li Îranê û li derveyî welat.

4- Beşdariya di sêminer û kongreyên edebî de, hemû gotar û nivîsînên min edebî an mêjûyî ne û ez firehtir basên tarîxî û mêjûyî (dîrokî) dinivîsim. Beşêkî zor (pir) nivîsên min çap bûn. Bi taybetî di kovar û weşanên nav welat û derveyî welat de.

Hûn rewşa edebiyata kurdî li Îranê çawa dinirxînin?

Êsta (niha) bi nisbet baş e, azadiya zimanê kurdî heye. Hemû kes dikarin bi kurdî binivîsin an bixwînin, kitêb û kovarên kurdî pir in. Her bi vî awayî edebiyata kurdî li Îranê ber bi pêş diçe. Edebiyata kurdî heta radeyek û zor bûye, şairên zor baş hene, ayend û dahatûyeke baş û ronak ji bo wê dibînim.

Nerînen we li ser zimanê kurdî ye yekbûyî çî ne? Ango çawa wê zimanê standard derkeve meydanê?

Bi baweriya min zimanê yekbûyî û standard kurdî di çêbûnê de ye. Bi taybetî ji bo ronakbîran ev ziman çêbûye. Ezê dikarim baş kurmancî bixwînim, baş fam bikim. Hûn jî wiha ne, tu dikarî bi soranî bixwîni û fêm bikî. Zimanê standard bi zorê pêk naye. Pêwistî bi dostayetî, peywendî, kitêb û kovaran heye. Miletên der û dora me jî hêştê zimanê yekbûyî pêk neanîne. Tirk, faris û ereb zimanê wan ê edebî nivîskî heye, lê ew ne zimanê standard û yekbûyî ye. Tirkên Tirkîyeyê bi şeweyekî dinivîsin, tirkên Azerbaycanê bi şeweyekî din. Erebiyeta kurdî jî bi du şeweyên zaraveyan tê nivîsin û her du şeweyên fêmkirin.

Rewşa edebiyata kurdî berî inqilabê û piştî inqilabê, çî ferq û cudayî çêbûye?

Inqilaba Îranê, dikaribû guherankariya mezin di jiyana gelên Îranî de pêk bîne. Ji bo kurdan azadiya ziman, ferheng û edebiyatê çêbû. Di dewra rejîma Şah de ew azadî tune bû. Kesî nedikarî bi kurdî binivîse; kitêb û kovarên kurdî tun û qaçax bûn. Lê niha ne wisa ye.

Çand û dab û ferhenga kurdî azad e. Niha çend kovarên kurdî wekî "Awêne" û "Sirwe" hene. Encûmenên edebî li hinek bajarên Kurdistanê wekî Mehabad, Seqiz, Bane, Bokan, Merîwan û Pawe çêbûn. Encûmena edebî ya mewlewî kurd li Sineyê kovara "Tavge" diweşîne. Encûmena edebî ya Seqiz kovara "Zewiye" dide weşandin. Qerar heye ku di sala 1376 (1997) de kovara "Awîyer" bi kurdî farisî li Sineya navenda Kurdistanê Îranê bête weşandin.

Hûn wekî kurdekî mehabadî çî diwazîn bejin?

Gotina min ew e ku keç û lawên kurd bixwînin û bixwînin, hînî ziman û ferhenga (çand) xwe bibin. Ji bîr nekînin ku ew kurd in.

Spas Kak Ehmed.
Spasiya min ji bo hemû kurdên Bakur û Başûr e.

HEVPEYVÎN
JAN DOST